

Serkeftina diplomasiya kurdan

Lozan li Lozanê mehkûm bû

✓ Digel hemû hewlên dewleta tirk, kurdan li Lozanê konferansek li dar xist. Di vê konferansê de Peymana Lozanê ku bûbû sedema parçebûna welatê kurdan hate nîqaşkirin û di dawiyê de biryarên girîng hatin girtin.

✓ Serokê Gişî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî peyamek şand konferansê û xwest ku pêşnûmaya peymaneke alternatif derkeve holê.

R 3



Encama serpêhatiya penaberiyê:

Kampa Lavrîonê



✓ Tirkîye her ku di warê navneteweyî de li pêşberî Yewnenîstanê tengav dibe, behsa Kampa Lavrîonê dike. Li gorî rayedarên Tirkîyeyê, PKK li vê kampê perwerdehiya siyâsi û leşkerî dide militanên xwe. Lê kampê, mexdurên şerê li Kurdistanê dihewîne. Ji ber vê yekê penaberên vê kampê piranî piştgiriya PKK dikan. Li aliyê din her çiqas rayedarên Yewnenîstanê li rewşa penaberên kampê dipirsin jî, rewşa penaberan nexweş e û zivîstanê jî li havîngehan dimînin. Wekî Serokê Belediyayê Lavrîonê jî dibêje, jîyana penaberan li ber xetereyê ye.

R 8-9

Mahmut Baksî: Nivîsîna lehengiya gerîla ferz e – Rûpel 16

Şehîd: Rêwîtiya azadiyê – Rûpel 6

Dadmendî: Yasa û fêrîn din (2) – Rûpel 4


Nûçeyen sansûrkirî: "Peymanê alternatif virazê" – Rûpel 15

Nejdet Buldan: Bela dîrokî (2) rpl.5

Mîrhem Yiğit: Şermezariya qureyekî me rpl.7

Hasan Kaya: Morîka xewê, Mehsûm û Lozan rpl.13

Bekîr Şîwanî: Aşî le Başûr rpl.11



SAMİ TAN

Durûti â dagirker

Di îngilizî de peyvek heye; "double standard", bi tirkî jê re dibêjin "çifte-standart", di kurdî de mirov dikare jê re bibêje cot-pîvanî an jî durûti. Dema yek li gorî cih û rewşa ku tê de helwesta xwe biguherîne, helwesteke ku li cihékî nîşan da, li cihékî din nîşan nede, jê re durû tê gotin.

Dewletên dagirker di warê durûtiyê de geleki jêhaîi û şareza ne. Bo nimûne, dewleta Îsraîlê dewleteke durû ye. Dema mirov bala xwe dide politîkayê wan ên li hemberî gelê cihû û gelê erek, ew durûti bi awayekî zelal derdikeve holê. Her wiha dewletên împerialist jî li hemberî gelê xwe pîvanekî bi kar tînin, li hemberî gelên din pîvaneke cuda bi kar tînin. Dema li welitekî bindest bi hezaran kes bêñ kuştin jî, bin guhê wan xwî nade, lê dema li welite wan tiliya yekî li kevirekî bikeve, kezeba wan dişewite.

Dewleta tirk jî di vî warî ji welitewan împerialist û Îsraîlê ne kêmşarezatir e.

Durûtiya rayedarên tirk ji bîrdoza fermî ya dewletê tê. Durûtiya dewleta tirk herî zelal di warê kêşeya kurd de derdikeve holê. Dema yek çêlî kurd û kurdayetiyê bike, qiyemetê radikin. Lî bi xwe ji bo çend hezar tirkên Kibris û tirkmenen başûrê Kurdistanê serxwebûnê dixwazin.

Şerî tevgera kurd wekî terorîzm bi nav dîkin, lê dema şervanên çecenan davêjin ser otelekê mirovén sivil dîl digirin, kîfa wan tê. Dewleta tirk a ku her roj çiyayê Kurdistanê bombebaran dike, rayedarên Yûgoslawyê şermezar dike, ji ber ku ew êrişî ser gundêni li Kosovayê dike. Dîsa heman dewlet, sirban şermezar dike, ji ber ku ew ji şervanên Artêşa Rizgariya Kosovayê re dibêjin "terorîst". Tiştê balkêşir dewleta tirk a ku nahêle li ser rûyê dînyayê kes qala kurdan bike, gazî welitewan din dike, da ku ew dest bavêjin vê pirşirêkê.

Bi rastî li hemberî vê durûtiyê mirov nizane ci bibêje. Durûtiya dagirker û

şûrkêşen rejîmê bêşînor e. Televîzyona regezperest (nîjadperest) TGRT, ku her roj bernamayê şerî taybet çedike, doza mafêñ arnawûdêñ Kosovayê dike. Vê televîzyona ku çend rojan berî niha êrişen ji yên xaçperestan tundtir dibirin ser dewleta Fransayê, ji ber ku wan tevkujiya ermanan pejirandîye. İcar ji çend xorten ewrûpî re li çepikan dida, ji ber ku wan ji bo êrişen kalikên xwe yên xaçperest ji tirkân lêborîn dixwest. Kesîn ku ji xelkê hesabê kîrinê nehşed salî berî niha dixwazin, bi xwe hesabê tevkujiya ermen û aşûriyan nadîn. Dema li welitekî çêlî vê tevkujiye tê kirin, hemû kevneperest û regezperest radibin ser piyan.

Di dawiyê de mirov dikare bibêje, heta ew durûti ji holê ranebe û gelê tirk xwe ji bîn bandorê vê bîrdoza durû rizgar neke û bi çavê ku li Bosna û Kosova û Çeçenistanê dîniherê, li gelê kurd jî nenihê azad nabe û biratiya gelan jî pêk nayê.

Durûtiya dagirker û şûrkêşen rejîmê bêşînor e. Televîzyona regezperest TGRT, ku her roj bernamayê şerî taybet çedike, doza mafêñ arnawûdêñ Kosovayê dike.

Şer û zagonê evînê

FAYSAL ÖZDEMİR

Ser û evîn, du peyvîn dijber in. Gava ku şer tê gotin; kuştin, birîndarî, xwîn, birçîbûnî, rezîfî, koçberî û hwd. têñ bîra mirov. Gava ku evîn jî tê gotin; xweşî, hezkirin, dilgesî û hwd. têñ ber çavên mirov. Lî heke ku mirov bi asayı, li ser van her du peyvan bisekine, rasîtiya wan derxe holê, wê were ditin ku, her du bi hev ve girêdayî ne, yekpare ne. Di vir de ew zagonê diyalektîku dibêje: "Yekîtiya dijberan" berbiçav e. Lî pêwîst e, bersiva 'ka şer û evîn bi ci awayî bi hev ve girêdayî ne', were dayin.

Cawa ku tê gotin şer; di riya dijwar de danîna politîkayê ye. Dîsa şer; dema ku riya siyasetê tê girtin, ew dikeve dewrê. Bi vî rengî divê evîn jî were naskirin. Li ser evîn emê ji Serokê Neteweyî du gotinan werbigirin: "Evîn; ew tişt e ku hezkirin digihêje asta herî bilind." Dîsa "Evîn; ew hezkirina ku bêdawîbûnî vegire." Li gorî ku evîn li ser hezkirinê tê avakirin, em dixwazin binêrin, ka hezkirin ci ye? Hezkirin li ser çar tiştan tê avakirin. Ya yeke-mîn, hevparî ye; duymîn, ewletî ye; sîyemîn, girêdan e; çaremîn; bi hev re pêşketin e. Hezkirin bi vî rengî gengaz dibe, gava ku digihêje asta herî bilind, dibe evîn. Lî girêdana

van her du têgihan bi hev ve ci ye?

Gava mirov dinêre, dibîne ku serdestan cewherê peyva hezkirin û evînê berevajî kiriye. Kapîtalizmê hêj pirtir li ser van têgihan texrîbat daye meşandin. Edfî li ser navê hezkirin bê hezkirin, li ser navê evînê bêevînî heye. Têkiliyê navbera jin û mîran, zarok û dê û bavan, bira û birayan û tevayê kesan bi tevayî, li ser bingeha

Ji bo evîn û hezkirinê divê welitekî azad hebe. Di devera ku destê her kesî bigihêjê de, hêlin û war nayê avakirin. Tevayê sewalêñ kovî jî bi vî rengî heye ji xwe re ciyekî bi ewlefî çeneke, nêr û mîyêñ wan nabin yek û hêlinan çenakin.

pereyan, berjewendî û ajoyan (gündü) têñ meşandin. Dîsa hevxapandin, di-zî, hev-firotin û sextekarî heye dawî heye.

Berî her tiştî divê mirov azad be. Lewra kesîn kole, ne dikarin hez ji kesî bikin û ne jî ji wan tê hezkirin. Ji bo ku mirov azad be jî, divê gelê mirov azad be. Lewra şexs bi serê xwe nikare azad bibe. Azadiya şexs-kekî bi ya civakê re çedike. Ji bo azadiya civak û gel jî, divê welitekî azad hebe. Bêyî welitekî azad, azadiya şexs, gel û civakê ne gengaz e.

Nexwe ji bo evîn û hezkirinê divê welitekî azad hebe. Di devera ku destê her kesî bigihêjê de hêlin û war nayê avakirin. Çivîk bi xwe jî hêlin na xwe li cihekî ku destê mirovan nagihiye çedike. Tevayê sewalêñ kovî jî bi vî rengî heye ji xwe re ciyekî bi asayî û bi ewlefî çeneke, nêr û mîyêñ wan nabin yek û hêlinan çenakin. Nexwe bê azadîkirina wela ze-wac û avakirina malbatê, ku di nav de evîn û hezkirin hebe, ne gengaz e ku li ser bingehêke rast were avakirin. Di vir de tê ditin ku pêsiya her tiştî de divê wela were azadîkirin.

Di roja iro de ji bo azadîkirina wela, ji bêyî şer tu çare tune ye. Nexwe divê şerekî dijwar were meşandin. Lewre bê hezkirin û bê evîn jiyan naçe şerî. Jiyana ku heye jî, bê rûmetî ye û dojeh e. Ji ber vî qasî ye ku iro di Kurdistanê de şerî azadiyê tê meşandin. Lî şerî leşkerî tenê têr na-ke. Bi şerî çekdarî re; şerî bîrdozî, çand, huner û hestan jî pêwîst e. Çawa ku iro ji van hêlan ve şer tê meşandin. Di vir de tê ditin ku, evîn bi esasî bi şer ve girêdayî ye. Iro şerî me evîn û hezkirina li ser bingehê rast dide afirandin. Dîsa şer, têkiliyê rast û durist dide avakirin. Ev ne ji bo jin û mîran tenê, ji bo tevayê ci-vakê wisa ye.

Ferhengok

akam: bandor, karîgerî	kışwer: dewlet; iklim
arîk: tavan	merkep: kefgîra darînî
bermal: taban	nepenî: veşarî
berzekirin: windakirin	olî: cihê ku pez lê alafê dixwe.
bizivîn: tevgerîn, livîn	pelex: qamîş
bûy: dawet	pitük: serê memikê
carenûs: qeder	sewalan:
çemîn: tewîn, xwarbûn	qedemgeh: daşîr, avdestxane
çilonayî: medenî hal	qewat û gerdiş: dab û nérît, orf û adet
cûzbend: benê nav	ramyâfî: siyâşî, konevanî
pirtûkan:	raz: sir
dadmendî: hîquq	reftar: tevger (davarname)
demdemî: netimî (geçici)	rêzan: qaïde
dêm: cihê bej	sermixûn: serbîjêr
dîfîn: beşa dev û poz lê ye.	serşo: banyo
diyarde: kirû (olgu)	sewî: sepeten fêkî û sewzeyê
duçan: hemile	sincî: ehleqî
duriskirin: pêkanîn, çekirin	siza: ceza
fîr: zanist, ilm	saqûlî: çelme
gimijîn: bisîrin (gülümseme)	şenber: berbiçav (somut)
hespê fal: hespê ku dilê wî dibije mehnînê	şipander: sivder (esik)
karîger: etkin	tevle: cihê hesp girêdanê
karîfe: kîran, hêzan	tîş: terikibûna dev û rû
kelij: otorîte, sulta	xîvet: kon, çadir
kelijî raperandinê: tat-bik	
kijûre: metrek, darikê ser kîran	

Serkeftina dîplomasiya kurdan Lozan li Lozanê mehkûm bû

Di nav biryarê encamnameya konferansa Lozanê de hate xwestin ku mafê çarenûsê yê gelê kurd bê pejirandin; xalên Peymana Lozanê, ku bûne sedema parçebûna welatê kurdan, bê betalkirin; zor û zilma li ser gelê kurd dawî lê bê. Her wiha zilm û zora li ser gelên din ên Kurdistanê jî hate şermezarkirin.

Konferansa Lozanê, ku bi pêşkêsiya Yekîtiya Hiqûqnasen Kurdistanê (YHK) hatibû sazkirin, rojêن 24-25'ê tîrmehê pêk hat. Konferansê, ji ber gefêne dewleta tirk, di bin bergiriyen berfireh ên ewlehiyê de, lê bi besdariyeke mezin roja 24'ê tîrmehê li qesebeya Ouchy li Hotela Royal-Savoy dest pê kir. Çend caran îxbara bombevê hate kirin. Berî konferansê, Serokê YHK'ê Veysel Akay û Serokê İnstîtuya Berlinê û Endamê PKDW'ê İsmet Şerif Wanly civîneke çapemeniyê li dar xistin. Wanly di civîne de da zanîn ku, ew dixwazin çalakiyeke zanistî li dar bixin. Wî diyar kir ku, mebesta çalakiyê ji hêla dewleta tirk ve hatiye berevajîkirin, lê tevî vê yekê jî dewleta Swîsreyê destûr daye çalakiyê. Wanly, ji ber vê yekê spasiyên xwe ji dewleta Swîsreyê re pêşkêsiya kirin. Serokê YHK'ê Veysel Akay diyar kir ku, ew digel Peymana Lozanê, li dijî Peymana Sewrê ne jî. Her wiha Akay, êrişa dagirker a dewleta tirk a li ser başûrê Kurdistanê bi bîr xist û got ku, bi vê yekê dewleta tirk bi xwe Peymana Lozanê binpê kiriye.

Di konferansê de jî axaftinê destpêkê disa ji aliye İsmet Şerif Wanly, Mebûse Cenevreyê û Civaknas Jean Ziegler û Serokê Belediyeya Lozanê yê berê Yvette Jaggi ve hatin kirin. Ziegler, bi girîngiya pûte pê dana dîrokê dest bi axaftina xwe kir. Wî got: "Heke yek ji dîrokê ne haydar be, pêşeroja wî/wê jî nabe. Lozan îxaneta li Sewrê ye. Wê peymana duyemîn, qet nebe mafê dewlet avakirinê dida kurdan û ermenan. Bi Peymana Lozanê Komara Kemalist hate avakirin. Wê komarê jî hebûna kurdan ku yek ji gelên qedim ên Mezopotamya-yê ye red kir." Mebûse Swîsreyê Ziegler got ku, ew dê piştevaniya têkoşîna gelê kurd bikin û axaftina xwe bi van gotinan qedand: "Bijî Kurdistanê Yekbûyi û Serbixe, Bijî Swîsre û Bijî Piştgirî!" Yvette Jaggi jî got, bi Peymana Lozanê geleki mafê dewlet avakirinê bi dest xistiye, lê welatê gelekî din hate parçekirin. Jaggi bal kişand ser rastiya ku gelên bindest yek bi yek mafên xwe bi dest dixin û diyar kir ku piştevaniya wan gelan peywîreke mirovperwerî ye. Rewşenbirê Kurd Wanly jî spasiyên xwe pêşkêsiya besdaran kir û konferans da destpêkirin.

Di roja yekemîn a konferansê de nameya İsmail Beşikçi ya bi sernavê "Bîrdoza Avabûna Komara Tirk, Înkarkirina Kurdan û Kemalîzm" nameya Fikret Başkaya "Rûxîna Avahîyan, Aborî-Ci-

vakî (Sosyo-Ekonomik) ya Kurdistanê" hatin xwendin û İsmet Şerif Wanly, İsmail Göldâş, Veysel Akay û Metin Ayçiçek li ser aliye cur bi cur ên peymanê peyivîn.

Serêvarkî jî, kêşeyen hindikahiyen ku ji Peymana Lozanê zîrar dîtine, hate niqaşkirin. Nivîskarê ermen Gaspar Armand, Serbalyozê berê yê Yewnanîstanê Themos Staforopoulos, Endamê PKDW'ê û Nûnerê Gelê Asûrî George Aryo û Riza Dinç besdar bûn.

Bi şev jî hemû besdarê konferansê û rojnameger bo xwarinê hatin vexwendin. Di vê xwarinê de tişte balkêş ev bû, hemû xurek ji hêla jînên kurdan ên li Swîsreyê ve hatibûna amadekirin. Hemû cureyên xurekan ji xurekên neteweyî yê kurdî bûn. Digel vê yekê hunremendê ku di nava Akademiya Koma Sefkan de xebatên xwe didominin, govend û stran pêşkêsi besdarân kirin.

Peymaneke alternatif divê were amadekirin

Di roja duyemîn a konferansê de tişte şayanî behskirinê peyama Serokê Gişî yê PKK'ê Abdullah Öcalan û biryarê encamê bûn. Biryarê encamê ji hêla Parlementera Swîsreyê Ruth Gaby Vermot Mangold, Serbalyozê Yewnanî yê berê Temos Staforopoulos, endamê PKDW'ê George Aryo û Serokê YHK Veysel Akay ve hatin amadekirin û pişti niqaşen dûvedirê hate pejirandin.

Berî encamnameyê Tirknas Prof. M. Hasretyan, Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya, Serokê Partiya Neteweyî ya Gallerê Marc Philips, Parlementerê Swîsreyê Hans Lindqvist, Parlementerê Yewnanî Kontas Banduvas, Angeline Frankhäuser peyivîn û nameya Serokê Gişî İHD'ye Akın Birdal hate xwendin. Serokê Partiya Neteweyî ya Gallerê Philips got ku, ew şerm dike ji ber ku di gîrêdana peymanê de İngilistan xwediyê rola mezintirin e û piştre jî diyar kir ku, ew dê piştevaniya doza kurdan bikin. Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya jî da zanîn ku, kurdan li Lozanê welatek ji dest da, lê iro têkoşîna neteweyî dê Peymana Lozanê bavêje ser tinga dîrokê.

Her wekî berê jî hatibû daxuyandin,



Dîmenek ji Konferansa Lozanê

Serokê Gişî yê PKK'ê Abdullah Öcalan peyamek ji konferansê re şand. Serokê PKK'ê Öcalan diyar kir ku, vê peymana navborî bi tenê xesar nedaye kurdan, her wiha gelên din jî jê xesirîne û gelên qedîm wekî rûm, ermen û asûriyan daxistîne radeya hindikahîyan û piştre jî hêdî hêdî ji holê rakirine. Öcalan xwest ku ji konferansê peymaneke pêşnûmayî ya alternatif ku rastiya gelên Anatoliyê li ber çavan digire, derkeve holê. Serokê PKK'ê di peymana xwe de bal kişand ser tişten ku hatine serê gelên ermen, rûm û asûrî û xwest ku li hemberî tevkijiya iroyîn a li ber gelê kurd xebateke gur bê kirin. Serokê PKK'ê got: "İro bûye mode û her kes hovîtiya Hîtler şermezâr dike, lê çima kes li hemberî Hîtlerê hovtîrîn dengê xwe dernaxe?"

Nûnerê rêtixtinê kurd; PKK, PSK û YNK'ê jî di konferansê de besdarî kirin û dîtinê xwe anîn ser zimên. Hêjayî gotinê ye ku, nûnerê kurdan digel Peymana Lozanê, nerazîbûna xwe li ser Peymana Sewrê jî derbirin. Nûnerê PKK'ê Esat Faraşîn da xuyakirin ku, her wekî Lozanê di Peymana Sewrê de jî vîn û iradeya gelê kurd xuya nakek û maflîn ku ji bo kurdan hatine destnîşankirin, dûrî daxwazê ne. Faraşîn, Peymana Sewrê wekî peymaneke ku mirî ji maka xwe bûye, bi nav kir.

Divê mafê çarenûsê yê kurdan bê pejirandin

Di dawiya konferansê de encamnameyekî ku ji 7 xalan pêk dihat, hate pe-

jirandin. Di nav biryaran de hate xwestin ku, mafê çarenûsê yê gelê kurd bê pejirandin; xalên Peymana Lozanê, ku bûne sedema parçebûna welatê kurdan, bê betalkirin; zor û zilma li ser gelên din ên Kurdistanê jî hate şermezarkirin û ji Kibrîsê vekişîna hêzên dagirker ên tirk hate xwestin.

Di encamnameyê de bang li welatên Ewrûpa û Amerîkayê jî hate kirin, da ku ew piştevaniya polîfîkayê dij-mirovî yên dewleta tirk nekin û alîkariyê nedin wê dewletê, ji bo ku kêşeya kurdî bi awayekî aştiyane çareser bibe. Ji bo raçavkirina xebatê seba bicihanîna van biryaran, Komîtiya Timî hate pejirandin. Komîte ji wan kes û saziyan pêk tê: PKDW, YHK, Normand Paech, Eberhard Schultz, Fabio Matelli, Ruth Gaby Vermot-Mangold, İsmet Şerif Wanly, George Aryo, Huber Benoit, İ. Metin Ayçiçek.

Roja 25'ê tîrmehê saet di 15.00'an de li dora 3 hezar kes li Qada Montbenonê civîyan, ku ber bi Chateau d'Ouchy (Qesra Osî) ku 75 salan berî niha lê Peymana Lozanê hatibû girêdan, dest bi mesê kirin. Di mesê de bi almanî, fransî sloganê wekî "Bijî Kurdistan", "Terrorist Tirkîye", "Bijî Serok Apo" hatin qîrandin. Digel wêneyê Abdullah Öcalan, alên PKK, ERNK û ARGK'ê û pan-kartênu ku li ser "Welatê di 1923"yan de li Lozanê parce bû." û "Ka welatê min?" hatibû nivîsandin, bal dikişand.

A. WELAT/ LOZAN

Yasa û fêrên din

Yasaya xwezayî bêyî ku bête nîvîsandin reftarê mirov saz dike û mirov bi jîrbûna xwe li ser vedibe, mîna akar û sincê (exlaq) mirov. Lî yasaya danînkî ango yasaya nivîsandî bi destê kelîjê yan xuhermendê (hikûmet) tê bikaranîn, lewre babetkirinê (senifandin) din ji yasayan re, tev de bi yasaya danînkî ve girêdayî ne, ango yasayê mayî tev de bi destê mirov û kelîjan hatine danîn.

Cureyên Yasayan:

Yasa bi pir rengan tê betabekirin ango yasa xwezayî û ya danînkî ji hev cuda dibin û yasa gelempêrî û ya taybetî ji hev cuda dibin. Dûre em dikarin yasayê danînkî yek bi yek bijmérin û şirove bikin

Yasaya xwezayî û yasaya danînkî

Yasaya Xwezayî: Yasayek bêyî ku bête nîvîsandin reftarê mirov saz dike û mirov bi jîrbûna xwe li ser vedibe, mîna akar û sincê (exlaq) mirov. Lî yasaya danînkî ango yasaya nivîsandî bi destê kelîjê yan xuhermendê (hikûmet) tê bikaranîn, lewre babetkirinê (senifandin) din ji yasayan re, tev de bi yasaya danînkî ve girêdayî ne, ango yasayê mayî tev de bi destê mirov û kelîjan hatine danîn. Yasaya danînkî yan navneteweyî be yan jî hundirîn be, ya navneteweyî têkiliyên kîşweran (dewletan) bi hev re saz dike lê yasa hundirîn têkiliyên di hundirê kîşwerê (dewletê) saz dike. Yasaya danînkî dibe ku gelempêrî be û dibe ku yasa gelempêrî hemû sazî û sazûmanên kîşwerê û têkiliyên wê bi mirovan re dixe bin siya xwe ango hemû kelîjen yasaya danînkî û dadwerî û raperandîn saz dike û ev yasayê hanê:

- Yasaya bingehîn
- Yasaya tawan û sizadanê - Yasaya navneteweyî ya gelempêrî
- Yasaya gerînendî dikevin bin siya yasaya gelempêrî

Lî yasa taybetî têkiliyên mirovên asayî bi hev re saz dike, mîna yasayê şarevanî û ya bazirganî û yasa navneteweyî ya taybetî dikeve bin siya vî besî ji yasayê ve,

Yasa Bingehîn: Ev yasa dirûvê kîşwerê û komîteyên wê akama kelîja wê, heta ku ye, xuyanî dike ango sînor û zêrobomên wê kîşwerê û kelîja ramyarî di destê kê de ye, yasa bingehî xuyanî dike.

Yasa gerînendî (îdarî): Têvelî di navbera yasaya bingehî û yasa gerînen-


dî, ne wisa zelal e. Ji ber kû her du yasa bi kîşwerê ve bi rengekî xurt girêdayî ne, lê belê yasaya gerînendî bêhtir bi kargêriya kîşwerê ve ya ji dezgehan re girêdayî ye, ango çawaniya xudkariya (serdestî) kîşwerê, yasa gerînendî diyar dike, lê yasaya bingehî, bê çawa kîşwer, mîna destek konevan û bervedêrî û sazkariya rista hundirîn dike, xuyanî dike, ango bi kurîtî yasaya gerînendî pêwendiyê komîteyên kelîja raperandine saz dike

- Yasa tawankariyê (sizadanê): Ev yasa tawanan dide naskirin û zewin û siza li hemberî kirina van tawanan xuyanî dike, ango ev yasa pêkanîna tu karî ji tu kesî naxwaze, tenê sizayan dide karîn qedexekirî, ango yasayeke fermandar e.

- **Yasaya riya dadgerînê (darizandin):** Ev yasa bi ya tawankariyê ve girêdayî ye, ji ber ku riya dozdarî û bervedêriyê (parêzerî) û hemû tiştîn bi dadgerînê ve girêdayî, xuyanî dike.

- **Yasaya Şarevanî:** Ev yasa pêwendiyê hemû mirovên di kîşwerê de saz dike mîna kirêdan, kirîn û firotina zewîzar (tiştîn neguhezbar) û tiştîn guhezbar, lê ev yasa ji yasa bazirganiyê cihê ye, ji ber ku yasa bazirganiyê bi herîşeyeke bazirganî taybetî ve girêdayî ye, lê her du jî yasayê taybetî têne jimartin û yasaya bazirganî bi xwe jî ya deryakî cuda dibe, ji ber ku yasa deryakî bi kirîn û firotina keşî û girêdarkîn guhestina deryakî û girewa deryakî û misogerîya wê ve, girêdayî ye.

- **Yasa navneteweyî ya gelempêrî:** Ev yasa hemû kîşwer û fereziyên navneteweyî di têkiliyên di navbera wan de, dixe bin siya xwe û rîzanîn xwe li ser wan pêwîst dike, ango ev yasa nekkîyên di navbera kîşweran de di riya rîzanîne pendî yan palanan re çareser dike û makderîn yasaya navneteweyî



Mirovahî ji bo sizandina sûcê dij-mirovî li çareyan digere, lê berjewendiyê dewletan rê neda ku dadgeheke li gorî daxwazê derdekeve holê. Di meha pûşperê rayedarê gelek dewletan ji bo avakirina dadgeheke navneteweyî di bin serperiştiya Sekreterê Giştî yê Neteweyen Yekbûyî Kofi Annan de li paytex ta İtalyayê Romayê li hev civiyan. Pişî nîqaşen dûvedirêj biryara avakirina dadgeheke navneteweyî hate girtin. Lî ji ber helwesta rayedarê dewletan, rayeya dadgehê gelekî bisînor ma. Bo nimûne ew dadgeh dê nikaribe dewlet darizîne, dê dewlet karîbin rê li ber dadgehê bigirin.

ya nûjen ev in.

- Palan û peymanên navneteweyî
- Qewatîn navneteweyî
- Bîr û bawerîyên neteweyîn pêşketî
- Biryarên dadwerî û nerînên mafnas û yasazanan
- Yasa navneteweyî ya taybetî:** Ev yasa ku sînorê dest beriya dadwerî û pêlanîna bi yasaya bêgane di hundirê kîşwerê de xuyanî dike ango ev yasa guh li du pirsan dike.

- Xuyanîkirin û hilbijartina yasaya ku dê bê raperandin

- Hilbijartina dadgeha ku babet dikeve dîva wê lê hilbijartina van her du hêmanan bi du tiştan ve girêdayî ye.

- Zêdyariya her du aliyê dozê û cihê wan.

- Rewşa bêganeyan ya yasakî di kîşwerê de û bi çareserkirina van pirsan yasaya taybetî rola xwe bi serî dike.

AMADEKAR: HOZANÊ DILZAR

Rêzimanê kurmancî

- Wane 22 -

SAMÎ BERBANG

Lêker

Bi vê hejmarê em derbasî na-va mijara herî berfireh û girfing dibin. Ev mijar jî lêker e. Celadet Bedirxan ev nav lê kiriye, lê hinek zimanzen din ev têgih nepejirandine û navê din lê kirine. Bo nimûne Murat Ciwan jê re dibêje "kar" her wiha Reşidê Kurd navê "Pîşk" ji bo wê guncaw dîtiye.

Celadet Bedirxan dema ew nav lê kikiye, girîngiya lêker li ber çavan girtiye. Lewre peyva lêkerê, ji lêkirinê tê. Ew lêker her wekî xuya ye wateya avakirinê dide. Her çiqas gelek wateyên wê yên din jî hebin, li vê derê di wateya avakirinê de ye. Her wekî çawa mirov dibêje, dîwar lêkirin. Hinek dikarin bipirsin ka em ji ku digihêjin vê encamê. Sedema gihiştina vê encamê di rista lêkerê de veşarî ye. Hevok li ser lêkerê tê lêkirin, bêyi wê hevok ava nabe. Heke mirov bi awayekî din bibêje, tu hevok bêyi lêkerê naçin serif. Hevokeke bêyi lêker, hevokeke nîvco (nîvçe) ye. Bo nimûne dema mirov bibêje: "Elî duh ji pirtûkxaneyê pirtûkek kirî." Mirov dikare vê hevokê bi awayekî sadetir jî wiha bibêje:

*Elî duh ji pirtûkxaneyê pirtûkek kirî.
Elî duh pirtûk kirî.*

Elî pirtûk kirî.

Elî kirî.

Kirî.

Di hevoka dawî de lêker bi serê xwe ma, lê dîsa jî hevok ji hevoktiyê neket. Lewre dema mirov dibêje "kirî" di nava wê de cînavkeke veşarî (Min, te, wî/wê, me, we, wan) heye. Ev her du jî têrî saz-kirina hevokeke dikin. Lê dema di heman hevokê de lêker aango peyva "kirî" jê bê xistin. Ëdî li holê hevok namîne. Kî dikare ci ji van peyvîn ku li pey hev rîz bûne fêm bike: "Elî duh ji pirtûkxaneyê pirtûkek ..." ? Dema mirov hevokeke wiha nîvco saz bike, tu kes jê tiştekî fêm nake, lewre dê nizanibin ka ci bi serê pirtûkê de hatiye.

Ji aliyê binesaziyê ve lêker

Piştî van agahiyên destpêkê êdî em dikarin derbasî taybetmendiyê lêkerê bibin. Pêşî divê mirov ji hêla kësim û teşe ve lêkeran hilde dest. Her wekî peyvîn din lêker jî di nava de par ve dibin ser sê cureyan; xwerû, hevedudanî û pêkhatî.

Lêkerên xwerû: Ev cure lêker her wekî ji navê van jî diyar e, di binyata xwe de lêker in û ji hêmaneke tenê pêk hatine. Dema li gorî dem û kesan neyên kişandin, qertafîn raderan (mesder) di-

girin. Wekî; kirin, çûn, xwarin, birin, ketin, hatin, sotin, bijartin, hinartin, xistin, mêtin, firotin, nivîstin, nihêrtin û htd.

Her wekî ji mînakar jî tê fêmkirin, dema qertafîn raderan bêñ avêtin, rayê lêkeran "Kir, çû, xwar, bir, ket, hat, sot, bijart, hinart, xist, mêt, firot, nivîst, ni-hêrt..." bi tenê dimînin li holê û mirov ji wê zêdetir nikare ji hev parce bike.

Lêkerên hevedudanî: Ev cure lêker ji çend hêman pêk hatine. Dema mirov wan hêmanan ji hev cuda bike, her yek ji wan xwediyê wateyeke serbixwe ye. Bo nimûne: Olandan, diyarkirin, danzanîn, başbûn, delalbûn, bilindbûn, hêvişikestin, bawerkirin, temaşekirin, hûrkirin, xerakirin, parkirin, şopgerandin, topavêtin, sorkirin, nexweşketin, dilmayin, bidestketin, jîbirveçûn, bi bîrbirin û htd.

Wekî balê dikişinîn, piraniya wan lêkeran bi alîkariya lêkeren mîna kirin, bûn, gerandin, avêtin, şikestin û ji hinek navdîr (hêvi, olan...) û rengdêran (sor, bas, nexweş...) pêk hatine. Dîsa tê dîtin ku hinek ji wan lêkeran wekî; hêvişkestin, dilmayin, bi bîrbirin lêkeren biwêjî ne. Tiştekî ku divê li ser vê mijarê bê gotin, awayê nîvîsandina wan lêkeran e. Ev cure lêker divê nava hevokê de ji hev cuda bêñ nîvîsandin. Yanê mirov nikare bi bîrbirin, "Zînê şopgerand" divê mirov bi-

bêje, "Zînê şop gerand."

Lêkerên pêkhatî

Mijara herî berfireh mijara lêkeren pêkhatî ne. Lêker di kurmancî de bi alîkariya paşgir û pêşgiran têne pê. Qertafî ci pêşgir ci ji paşgir bi serê xwe nexwediye tu wateyê ne, bi lê dema bi lêker, navdîr an ji rengdêrekê ve dibin, wateyeke nû didin wê. Di kurmancî de paşgirîn ku bi alîkariya wan lêkeren pêkhatî çedîbin ne gelek in, yên herî zêde têne bi-karanîn paşgirîn -în, -andin in. Ev her du paşgir ji navdîr û rengdêran lêkeran çedîkin. Ji wan -în lêkeren negerguhêz (têneper), -andin jî yên têneper çedîke.

Rev ⇔ *revîn* ⇔ *revandin*

Fir ⇔ *firîn* ⇔ *firandin*

bez ⇔ *bezîn* ⇔ *bezandin*

ês ⇔ *êşîn* ⇔ *êşandin*

Kel ⇔ *kelîn* ⇔ *kelandin*

cemed ⇔ *cemidîn* ⇔ *cemidandin*

ilm ⇔ *elimîn* ⇔ *elimandin*

hew ⇔ *hewîn* ⇔ *hewandin*

kew ⇔ *kewîn* ⇔ *kewandin*

xap ⇔ *xapîn* ⇔ *xapandin*

û sorandin, keskandin, xweşandin,

germandin û reşandin, şopandin...

Ji bili wan çend heb paşgirîn din jî hene, wekî -ijîn, ijandin, isin, isandin.

Bo nimûne:

Germ ⇔ *germîjîn* ⇔ *germijandin*

Kel ⇔ *kelîjîn* ⇔ *kelijandin*


Tam ⇔ *tamîjîn* ⇔ *tamijandin*

Tep ⇔ *tepisîn* ⇔ *tepisandin*

Rep ⇔ *repisîn* ⇔ *repisandin*.

Bela dîrokî (2)

NEJDET BULDAN



Em careke din li ser cerdevanî an jî çehşinîyê bisekînîn. Ew gotinê me yên berî demekê ji bo Bakur jî tên qebûlkirin. Yanî lîstikên dijminî û alîkariya dijminî. Mixabin iro cerdevan ji gerîlayan zêdetir in. Bi deh qatan zêdetir in.

Ü dema mirov cerdevanîn veşartî ji hesab bike, ev hejmar bêhtir dibe. Mijara cerdevanyî bi çend xalan tê şîrovekirin.

Bi exlaqî tiştekî şerm e. Navê wê navekî qirêj e. Ew kesên cerdevanyî dikin, li dijî kultur û nîrxên hemwelatiyê ne. Piraniya wan jî li ser navê eşâriye vê xebatê dimeşînin. Eşâriye bi pereyan xwe firotin nîn e. Di dîrokê da eşâriye yekxeberî ye. Rastî ye, mîranî ye. Gelek çehşen vê demê kurên wan, keçen wan an jî xizmîn wan gerîlan e. Kurd bi mîrxasiya xwe hatine naskirin. Eger sedemê cerdevanyî aborî bin, jîjana şermezârî ji mirinê mez-

intir e.

Bi siyâsî jî nayê qebûlkirin. Li rexekî şerî azadiyê li hemberî hemû tengavî û astengan bête kirin, li deverike din mirov alîkariya dijminê xwe bike. Şervanê Azadiyê vê tekoşînê ji bo xwe tenê nakin. Eger azadiyek pêk bêt, ji bo hemû kurdan e. Azadî bi alîkariya hemû rengan pêk tê.

Eger ev tekoşîn bête pirçiqandin, dengê gelê kurd tê birîn. Serkeftin ji bo dijmin e. Civaka Kurd bi çehşen xwe ve dibe kole. Gelo, azadî an jî koletî?

Bi wekhevî jî nîn e. Ew kesên reiscahş li malên xwe rûniştine. Ji terefê dewletê ve tê parastin. Naçin şer. Tîrsê û birçibûnê nabînin. Zarokên wan namînin sêwî. Nayîn kuştin û birîndar nabin. Heya niha kîjan reiscehş an jî zarokên wan hatine kuştin, an jî birîndarkirin? Ji terefê dewletê ve qedr û qîmet ji bo wan e. Ew qedr û qîmet jî demdemî ye. Dema karê dewletê bi wan xelas bû, ew jî ê bi destê dewletê bêñ berzekirin. Di dîrokê de mînakên wan pir in.

Bi olî yanî bi dîn jî nayête qebûlkirin. Di hemû pirtûkên pîroz de pesna azadîxwazan têne dayîn. Xwefirotin tê şermezarkirin. Îxanet tê rûreşkirin. Dewleta Tirk ol jî xistiye bin berjew-

endiyên kemalîzmê. Cehşen Bakur giş misilman in. Qey bi bisilmanî jî hîzren xwe nakin?

Bi dîrokî jî çehşînî hatîye reşkirin. Gelo li dîroka Başûr mîze bikin. Axayê Zêbariyan Zubeyrê Mexmut Axa, axayê Herkiyan Mixê Herkî, axayê Doskîyan Dêwaliyê Seîd Axa bi bîr bînin. Di dema serhildanê Bakur da li Cemîlê Çeto, Xesen Xeyrî û hevalbendê wan temaşé bikin. Di wan salêñ borî de li Rojhilat (Iran) Samî Begê Hinareyî û Reşît Begê Beyzade jî wekî we kiribûn. Giş jî axa bûn. Lî belê alîkarêñ dagirkeran hatin kuştin. Çima? Dagirker jî dizanin, mirovîn ku bi kîrî gelê xwe neyên, bi kîrî wan jî nayên.

Di qada navneteweyî de jî ev pirs ji me tê pirsîn. Biyanî ne, xerîb in. Kurdistan nedîtine. Lî belê rewşa wê baş dişopînîn. Bila xwendevan li min biborin piraniya çehşan dibêjin xerîban kafir.

Gelo ew kafir (!) jî vê pirsê ji me dîkin: "Ew kurdên we çima dîbin cehş?"

Ü şervanîn azadiyê jî her dem banga efûyê dikin. Pêwîst e ku bersiva wan bi camérî bête dan. Loma rojên pêsiya me belkî derengî bin.

Ji Efrînê heyâ Nûrheqê Rêwîtiya azadîyê

"Neyaran em kirine çi halî! Li vê xwezayê binihêrin. Çi xweş ú şérîn e, çi bi şewq ú şemal e. Weki heyva çardeh sevî ye. Çavên mirov li ber venabin. Binihêrin li van çem ú kaniyan, li mérôg ú newalan! Binihêrin li van zinaran. Tu dibê qey bi çakîçan şeh kirine, ger xwe-diyê vî welatî hebiyya..."

Rêheval Mahmûd, pir wext derbas bû, di ser vê axaftina birayê te hevalê Hemo re. Rêheval, we jî dara azadiyê bi xwîna xwe av da. We şerekî dirêj li dijî hov ú dirindeyan meşand. Rojên we hemû bi şoresseriye hatibûn dagirtin.

We pir rojên dijwar û zehmet li çiya-yen Tolhildanê derbas kirin.. Li ber sermê ú seqeme rûyên we tîş lê vebûbûn. Li ser berfê pî ú destêne we vesewitîn. Hûn bi şev ú roj li çol ú çiyan bûbûn mehkûmê welatê xwe yanî parêzkarê Welêt. Bi hezaran leşkerên dijmin bi şev ú roj li pey we bûn. Lî dîsa jî tu hêzê nikarîbû bandora xwe li we bikira. Lewra we rihe xwe bi axa welat ve girêdabû.

Axaftina birayê te Hemo ya li ser gorâ Nûrî Dêrsimî xweş tê bîra me. Hemo geleki bi dilgermî axivî ú kela dilê me rakir. Xwîna canê me kelând. Lewre Hevalê Hemo, weki kesekî ku dîroka Kurdistanê bi çavê serê dîtibe, li ser dî-rokê agahdar bû.

Bi rastî jî cihê we, di pey we de di na-va gel de gelek hate xuyakirin. Çûyina we, valahiyeke mezin li herêmê pêk anîbû. Lewre we tu car dilê kal, ciwan an jî zarokêkî/e sar nekir. We, hemû zanîn ú ramanê ku ji Serokatiyê girtibûn, bi cangoriyeke mezin pêşkêş gel kir. We nezan zana, xizan bi hêz û tirsonek bi dilawer dikir. Hûn bi biratî ú şoresseriya xwe di nav gel de wekî mînak dihatin nîşandan. Ji ber ku têkiliya we li ser rizgariya welat û gel hatibû danîn. Vê yekê biratiya we jî bi qîmetir kîribû. Ev biratiya we, li Akademiya Mahsum Korkmaz di pîrozbaşıya ji bo 15' dê gelawêjê de li ber çavê gelek kesan diyar bûbû. Wê rojê dîsa em mîvanê Hevalê Hemo bûn. Ew, wê demê endamê ARGK'ê ú yek ji xwendekarên Serokatiyê bû. Hevalê Hemo, bi çekêne leşkerî bejna xwe pêçabû. Te gotibû Hevalê Hemo: "Ez jî dixwazim bibim şervanekî Welêt." Li ser vê gotina te Hevalê Hemo em birin ser gora Şehîd Hemze. Dema em hilkişîn ba goristanê, bi hezaran gel li wir amade bû. Hevalê Hemo jî komaku tu jî di nav de bû, kişand cem gora şehîd Hemze ú axaftineke gelekî hestiyar û kariger kir. Te jî heman rojê berî ku em razen, cara dawî wisa gotibû: "Tişteku ez pê dizanîm, ger mirinek mirov hebe, divê di nav şoressê de li ser axa Kurdistanê be..."

Erê hevalê Mahmûd, te ew xeyalê xwe di jiyana xwe de pêk anîn. Şeveke tarî bû. Wê şevê Hevalê Hemo, li ser sî-norê derewîn ji te re wiha got: "Hevalê



hêja! Divê em şîrê dayika xwe helal bîkin, da ku bavo û dayê jî bi me ser bilind bibin." Pişti gotina xwe, Hevalê Hemo têla stirî jî te re rakir û got: "Serkeftin be ji we tevan re! Ez ê di demeke nêzîk de werim ba we." Birayê te jî pişti demeke kin xwe gîhand we. Dijmin êdî nikarîbû we ji çiyan dûr bixista. Lewre hûn bûbûn sér li Nûrhaq û Engîzekê. Lî mixabin kurmê darê di qada şer de, li cihekî bêkeys derket holê.

Şoresseriya te û hevalê Hemo wekî li Efrînê (li Başûrê Biçûk navçeyek e) li Tolhildanê jî nav û deng dabû. Celadan, ji bo ku teslimiyetî bi te bidin pejirandin, tu li gundê çiyayê Nurhaq û Engîzekê digerandin. Lî te bi serbilindî li ber xwe da û tu axivî. Axaftina te gelekî bi bandor û watedar bû.

Têkoşîna te dijmin dîn û har kir. Ji bo ku te li pey panzerê kaş bikin, werîs li stûye te pêçan lê werîs qetiya. Peyre celadan zincîra hesinî anîn. Ew zincîra ku bi destê neviyê Cengiz Hanê hov hatibû çekirin, weki marê sicimî xwe li te dizivirand, da ku ruhê te yê mezin teslim bigire. Te jî mîna birayê Hemo, li ber xuşandinê dest bi ken kir. Ew kenê we, kenê hêviyê û serkeftinê bû, kenê têkbîrina psîkolojiya dijmin bû. Lewre we dijmin ji hundir ve dabû şikandin. We lawazbûn û rûreşîya wan, mîna neynikê li ber çavê gel zelal kiribû. Wan jî dixwest şeref û rûmeta we, ku we ji Partîyê girtibû, bikin pêkenokên dembûhêrkên xwe. Celadan, tu li seranserê Çiyayê Engîzekê li dûv panzerê kaş kirî. Wan, tola xwe ji te hildianî. Tu derneke dirêj di bin kelagerma tavê xuşandin. Cilêne te bûbûn parî parî. Her şerçeyekî kîncen te, li cihekî hatibûn belavkirin. Ew par-

ce, di nav xwîna paqîj û zelal de sor bûbûn. Bi taybetî ew, kefiya ku birayê te dabû te, bibû sê perçe. Parçeyek bi dara mazî, yê din bi dara kezwanê, parçê sisyan jî bi dara xernîbê ve hatibû dalîqandin. Ji dûr ve mîna ala Partî, Enî û Artêşê xuya dikir.

Erê Hevalê Mehmed dema tu kaş dikirin, kevir û zinaran dixwest xwe ji bo te nerm bikin, erdê serê xwe ji te re datanî, deviyan dixwest ji te re bibin kula-vê hîrî. Lî mixabin, dijmin dev ji te bernedida. Xwîna te dilop dilop dirîjiya nav axê, mîna tovê jiyanê. Peyre ew xwin di bin erdê de kelîya, fûriya, wekî kaniyên biharê der bûn û serberjêr bi hêla Başûr ve mîna Çemê Ferat û Dîjle herikîn. Çermê bedena te, tev bi devî û keviran ve zeliqîn. Her parîyek jê, mîna ale dibi-rîqiyan û bûn nîşana azadiyê, ji wê qada pîroz re. Edî panzerê tû nedîkişandî. Panzer û zincîr jî li ber berxwedana te teslim bûn. Dijmin bi zimanekî xwîn û kêm ji gote te: "Biqîre! Bejê ax... Em ê te berdin, em te nakujin...." Te rik û kîna zilma hezar salî li dijî neyar xistibû dilê xwe. Lî mixabin zimanê te lê nedîgeriya ku, tu ji wan re du gotinan bibêjî. Zimanê te qelişibû, diranê te hûr bûbûn, erzana (çene) te şikestibû, qirika te zuha, lîvîn te şewitibûn. Lî dîsa jî te nîşana serkeftinê nîşanî neyaran da. Dijmin li ber lehengiya te bûbû mîşek biçûk. Kezeba dijmin jê diweşîya. Wan ji neçarî her du tiliyên te bi agir şewitan-din. Lî dîsa jî te negot, "Ax"

Celadan peyre tu birin newaleke kûr. Dema te çavên xwe bi zorê ji hev vekirin, di binê wê newala kûr de, cihekî bedena te sax nemabû. Lî dîsa jî çavên te mîna ji hemû zindîyan re bigota: "Yê ku

li ber êşa şervanî dikeve, divê reşiyê li xwe negerîne. Yê ku ji şervanî hez dike, pêwîst e kare şoressê bikêfxweşîyeke bilind bidomîne. Bila dijmin reşîya bi ser xwe de berde. Em doza mirovahiyê dîkin. Lî ew..."

Ji keynî vê jî, biratîya te û hevalê Hemo, mîna biratîya Hevalê Mazlum û Delîl Doğan, Hevalê Mehmet û Haydar Karasungur û biratîya hevalê Muhemed med û Mustafa (Çilo) Birahîm bû.

Eze bêjîm ji Effînê ji gundê Şîtka Hevalê Hemo û Mehmed Yusuf, ji bo rizgariya welatê xwe şer kirin. Di sala 1992'an de di meha cotmehê (kewçêr) de Hemo, di sala 1993'an de Mehmed li Eyelata Tolhildanê, bi berxwedaneke dîrokî gihiştin karwana nemiran. Ez ê herim cem dê û bavê te, ez ê bêjîm bila bikşînîn serê dîlana daweta te û birayê te. Bila hemû bigirin sond û peyman, da ku cihan bizanibe tola we namîne li ser axa Kurdistanê.

Belê hevalê Mehmed, roja îlankirina şehadeta we bi hevre hate çekirin. Ji ber ku dê û bavê te, bi şehadeta hevalê Hemo nîzanîbûn. Dayika we li ber wêneyen we û li pêş gel wiha got: "Ez bûm dayika du şehîdan û ez ê bibim dayika şehîd sisiyan jî!" Bavê te jî bi dilekî germ wiha got: "Ez bûm bavê sér û pilîng, ji bo min û gelê min şehadeta van şerefeke mezin e." We herdu lehengan şîrê dayika xwe yê spî û keda bavê xwe li xwe helal kir. We bi xwîna xwe Başûr û Bakura Welêt kir yek. We bi xwîna xwe, destana dîrokî derbasî nav destanê mirovahiyê kir. İro li her derê dîroka destana we ji zarokê Welâtê Rojê re tê xwendin.

MUHAMMED MUHAMMED

□ 01.08.1981

Bese Yanûş (Gencer) şehîd ket

Bese Yanûş, di sala 1961'ê de, li gundê Esmepurûyê ku bi Pazarcixê ve gîrêdayî ye, ji dayika xwe bûye. Di sala 1978'an de, têkoşîn nas kir û tevî nav rafêş şoreşê bû. Li Pazarcixê, di nav jin û malbatan de xebîfî. Di sala 1981'ê de, li gundê Muso, di navbera şoreşger û hêzên dewletê de şer derket. Yekemîn şehîda jin a Partiya Karkeran Kurdistanê ye.

BÜYERINE JI DÎROKÊ

□ 06.08.1945:

Bombeya Atomê avêtin Japonyayê

Dewletê Yekbûy yê Amerîkayê(DYA) di şerê Cîhanê yê Duyemin de, li hemberî Japonyayê cara yekemîn bombuya atomê bikar anî. Wekî tê zanîn bombuya Atomê Albert Einstein icat kir. Amerîkayê yekemîn bombe avêt Hîroşimayê. Pişti sê rojan di 9'ê gelawejê de Amerîkayê bombuya duymen avête Nakazakiyê, bi dûv yê bombeyê re Japonya teslim bû. Di encama herdu bombayan de nêzîkî sed û pêncî hezar mirov mirin, bi hezaran ji sejet man.

Lêkolîner-Nivîskar Sirri Öztürk:

îro birjûwazî ji karmendan natirse

"Birjuwa biçük dibêje her tişt ji xwe tê. Lê her tişt bi hêza karkeran tê. Zagonê 27'ê gulanê ji bi xwesteka karkeran hatine. Şoreşa Kubayê ji ne bi Fîdel Castro û hevalên wî tenê hatiye. Berê wan, Partiya Komunîst a Kûbayê di 1903'yan de hatiye avakirin. Ü şores ji bi alîkariya karkeran çêbûye."


Roja 25 tîrmehê li Navenda Çanda Alternatifî bi navê "Li Tirkîyeyê çîna karke ran û bizavêñ sendîkayî" panelek hate lidarxistin. Panelîst Lêkolîner-Nivîskar Sirri Öztürk bû.

Sirri Öztürk got: "Ez bi awayekî zanîstî di xwazim nîqaşê bikim. Zanebûna koronolojîk nadim we, ev ne rîbaza min e. Metoda min; îro dê dest pê bikim û biçim dîrokê û ji dîrokê dest pê bikim werim îro."

Öztürk wiha gotina xwe dom kir: "Dewlet di afirandina sendîkayêñ zer de pispor. Di livbaziyan de bi govend gerandinê, birjûwazî bi paş de gav navêye. Livbaziyan 15-16 pûşperê bi birjûwa paş de gav daye avêtin. Livbaziyan îro bi birjûwayê paş de gav nade avêtin. Îro birjûwazî ji karmendan natirse." Öztürk, di axaftina xwe ya ser sendîkayân da zanîn kû li aliye kî sendîkayêñ ku derdikevin livbaziyan û li aliye din ji sendîkayêñ ku dixwazin bi serdestan re peymanan çêbikin hene.

Lêkolînvan-Nivîskar Sirri Öztürk li ser 'Marks, Engels, Lenîn û Şoreşa Çinê' bi vî şeweyî sekîni: "Hinek dibêjin Marks û Engels filozof in, lê Marks û Engels ne tenê filizof in, ew bi xwe militan in. Lenîn, Marksîzm şirove kir û gîhîş şoreşê. Loma dîbêjin Lenînîzm. Şoreşa Çinê şoreşa gundiya ne. Di Sovyet û Çinê de Sosyalîzm pêk nehatiye. Loma hilweşıya. Baş bû ku hilweşıya."

Nivîskar Sirri Öztürk bi piranî li ser burjû-



waya biçük sekînî û dîtinêñ xwe anîn zimêñ. Li gorî wî birjûwaya biçük dîroka Tirkîyeyê tevîlîhev dike. Rewşenbirêñ çepgir ên birjûwa yêñ biçük nîv rewşenbir in. Gava li ser tiştîkî nîqas dîkin tehlîlîn wan ji nîvco ne.

Öztürk li ser rola karkeran ji wiha got: "Birjuwa biçük dibêje her tişt ji xwe tê. Lê her tişt bi hêza karkeran tê. Zagonê 27'ê gulanê ji bi xwesteka karkeran hatine. Şoreşa Kubayê ji ne bi Fîdel Castro û hevalên wî tenê hatiye. Berê wan, Partiya Komunîst a Kûbayê di 1903'yan de hatiye avakirin. Ü şores ji bi alîkariya karkeran çêbûye."

Sirri Öztürk li ser rîexistinêñ çepgir ên Tirkîyeyê rawestiya û gazinêñ xwe bi vî rengî anîn zimêñ: "Rîexistinêñ me yêñ çepgir gelê me baş tehlîl nakin. 65 milyon gel li ser vê axê diji. Divê mirov çand û dîroka vî gelî baş tehlîl bîke. Di nav rîexistinan de ji bo yekîtiyê ji yekîtiyekî siyasi pêwist e."


Du dawîya axaftina xwe de, Sirri Öztürk pîrsîn besdaran bersivandin. Li ser pirseke bi rengî "Di Tirkîyeyê de li dijî şîdetâ dewletê, şîdetâ hinek rîexistinan heye; hûn vê şîddetê çawa dinirxînî", Öztürk wiha bersiv da: "Şîdet ji, şer ji kapîtalîzmê derxistine holê. Îro şerekî qirêj li Tirkîyeyê heye. Ev şer ji gelan re menfetekekî nayine. Ez li dijî vî şerî me." Ez ji têkoşîna çînayatî bawer dikim."

C.ANDOK/ STENBOL

ÇAVDÊRÎ

Şermezariya
qureyekî me

MÍRHEM YİĞİT



Qure ye, rî nade kesî, kesî nayîne gwîzeka xwe. Kes ne berberê wi ye ú xweziya min ne bi dilê wî ku têkeve tora wî û pê re têkeve devjenkê. Zimanê wî her çendî dialiqe ji ne bostek belê zedeyî gazekê ye.

Wiha ji mirov di kare bêje: Teniya binê beroşê û mîna zemqa çarsed û çar e. Tu bi qurûşekî têkevî bazara wî, bi pênsedi ji der-nakevî, dibe benîşt û bi mirovve dizeliqe. Xislet û xweseriyan wî zehf in, ne ev bi tenê ne, hê ji hene:

Çûkê çîlzman e. Bi gotineke ku ji erebî ketiye nav kurdî û ji Binxetê hilkişiyaye Serxetê, "şatir" e. Ku devê wî carekê vebû, kes nikare bigire. Dide nav, ji aş û baş diştexile, dinyayekê xerab dike û çaran ava dike, di nav çend kîlikan de erd û ezmén tev dide, duh û îro ser-obîn hev dike, kerê filan di korê bêvan re derdixe. Em hinekî din têkevin pey şopa wî û çend taybetmendiyen din ji bihejmîrin.

Xwe bi kesî nade, xwe di ser herkesî re digire û kesî naecibîne. Rexnegir û ji her tiştî û ji her kesî bi gazin e; ji kesî re nabêje maşeleh, nizane bêje 'mala te ava'.

"Şoresger e", "internasyonalîst e", "antîpostmodernîst", "antîkapîtalîst" û "proleter e". Agir ji devê wî dire, virde wirde nizane, xwe di alyê îdeolojîki de bi tepiskan dawedişîne û darî çav qet xuşûke biçük ji qebûl nake. Di mala wî de wêneyê Serok û yên şîhîdan li çîhîn herî berçav in. Heta çûye ba Serok ji. Tu li gotinêñ wî binêri bêqusûr e.

Ferhenga wî tije rengdîrêñ giran, tûj, hişk û çort e. Kes bi qasî wî ketûber, hemwelatiyêñ xwe bi peyvîn mîna "xayîn", "roformîst" û "di jî şoresê ye" tawanbar nake. Kesê wî ji nêzîk ve nas neke dê bêje, "mala vî mîrî, ma gelo kes wek wî heye, ci mirovke radikal e, xwedî helwest û alîgir e, bi cesaret û xwedîfarmanc e." Di civat, civîn û semîneran de wiha berçav dike, wiha tê naskirin. Ev e bi kurtî û maj û wechê mirov ji derve dibîne, li ser dike, xwedî fikrek. Wekî din.

Di mala xwe de beg e, zirçone ye, axe avê li desten wî nakin, ne mirovke çavteng e, ne ji xesîs e. Bêguneh û bêmibalexe, bi qasî pênc kesan dixwe. Bi goşte di mala wî de mirov dikare dike qesaban veke. Tu çu rengê goşt bixwaze pêde dike. Ji yê meksûd heta bi yê taze, ji yê xisûsî û "çîkofteyî" heta bi rihnêñ sax û her cure goşte hêrtî û bihestî. Şîva şeveke wî têra mûlidekê dike. Ew ne qûtê salekî belê yê çend salan daftîne. Ci dike ci nabe, te dît xela rabû yan ji şapeyek çêbû, qezeyek û beleyek qewimî. Em evdê ser-reş in. Kesê bêqusûr tune, kêmâniyêñ me hemûyan hene. Bêqusûr ne karê evdan e. Lewaziyêñ me gişan hene. Hin qusûrê "bêqusûr me" ji hene. Ew gotinêñ xwe ne ji bo ku li wan xwedî derkeve û li gorî wan bijî, dibêje. Gotin û kirinêñ wî li hev nakin. Jiyana wî û rabûn û rûniştina wî, giş gotinêñ wî red dike û derewîn derdixe. Ew hinekî dişibe kategoriye melayêñ gundan ku dibêjin 'bi ilmê me bikin belê bi emelê me nekin'. Gotina dawî: Li wir li derveyî welat, di nav rewşenbîriya me de hê hejmareke wiha ku gotin û kirinêñ wan bi hev re ne aşîna ne têne dîtin û carnan ji tu dibînî ku di kîlîkeke kes ne li bendî de û di şexsê yekî "pir nêzîk" de xweli li serê xwe kir.

Derketina 17 ciwanîñ kurd ji Swêdê û bîryardariya wan ji bo xebateke gerîlayî û profesyonelane, xwelewitandin û xweniciskirina malbateke me û şermezariyêñ qureyekî me derxiste meydânê.

Encama serpêha

✓ Dema li Yûgoslawyayê şer derket, penaberên

Yûgoslawî li welatên Ewrûpayê wekî mexdûrên şer hatin hesibandin. Pişti ku şer li welatê wan sekînî, ew şandîn welatê wan. Ji bo kurdan jî em dixwazin ev statû were qebûlkirin. Wekî din çareseriya meseleya penaberiyê ne mimkûn e.

Kampa

Nûnerê Heyva Sor a Kurdistanê yê Yewnanistanê Hasan Özgür:

Divê penaber wekî mexdûrên şer bê dîtin

Penaber di warê tendirustî de li problemên çawa rast tê?

□ Ez pêşîn dixwazim li ser helwesta dewleta tirk rawestim. Lewre dewleta tirk dixwaze me jî welatê me biajo. Di vî warî de li Yewnenîstanê xebatê me hene. Pênc kampê penaberan li Yewnanîstanê hene: Lavrion, li nêzî Lavrionê Sunîon, Lutrakî, Pendeli û Ayas Stafamos. Li gorî imkanên xwe, em diçin serdana kampan û tendurisiti penaberan seh dîkin.

Li kampê problema esasî ev e ku, binî geha jiyanekî asayî nîn e. Li kampan cih, qedemgeh, xwarin û vexwarin kêm in û ne tendurist in. Em didin xwe ku kampan bînîn ba hev, jiyanekî baş û tendirust pêk bînîn. Demeke dirêj e em li ser vê babetê bi rayedarêne dewleta Yewnanîstanê re hevdîtinan saz dîkin. Lî ta niha encamên ku em dixwazin, nehatine wergirtin.

Gelo ji xeynî Heyva Sor a Kurdistanê, tu saziyên tenduristiyê alikariya penaberan dîkin?

□ Bi rastî van saziyan ta iro bi awayekî ciðî alikarî nedane penaberan û li rewşa wan nepirsîne. Ji ber ku ev sazî bêhtir xwe dispêrin dewleta Yewnanîstanê. Yewnanîstan wekî dewleteke demokrat tê dîtin, ev sazî jî dibêjin, divê Yewnanîstan hemû pêwîstiyê penaberan peyda bike.

Yewnanîstan bi têra wan pêdîviyêne penaberan peyda dike?

□ Na. Tiştî dide têra penaberan nake. Em Heyva Sor a Kurdistanê û hînek saziyên din yên kurdan, hewl didin ku mafêne penaberan yên sereke bistîn. Bi taybetî dewleta Yewnanîstanê mafêne penaberiyê napejirandiye. Kampênu ku hene jî resmî nîn in. Ev kamp, havingehîn xwendekarêne Yewnanîstanî ne. Ji mecbûriyetê penaber zivistanê li van cihan dimînin. Ji bo ji-yîn cîhekî ewledar nîn e. Sîgorta Civakî ya Yewnanîstanê bi hînek penaberan re tekilîdar dice lê ew jî naxwaze zêde tekilîdar bibe. Resmîyeta kampan tune ye. Ev însan wekî penaber nayen hesibandin.

Italyayê mafêne siyasi dan penaberan. Yewnanîstan kurdan wekî penaberên siyasi nabîne û zû bi zû penaberiyê jî qebûl na. Dema bike jî, dîsa problemen sosyal û aborî hene. Em jî hewl didin ku Yewnanîstan van mirovan wekî "mexdurên şer" qebûl bike û pişti ku şer xelas bû, careke din wan bişîne welatê wan. Wekî nimûne, dema li Yûgoslawyayê şer derket, pe-

naberên Yûgoslawî li welatên Ewrûpayê wekî mexdûrên şer hatin hesibandin. Pişti ku şer li welatê wan sekînî, ew şandîn welatê wan. Ji bo kurdan jî em dixwazin ev statû were qebûlkirin. Heger neyê qebûlkirin, çareserkirina penaberuya kurd ne mimkûn e.

Yûgoslawya dewletek bû û lê iro kurd hemwelatiyêne dewletine din in. Gelo ev statû bo kurdan mimkun e?

□ Rast e. Statûteyeke wiha ya kurdan tune ye, lê têkoşîna gelê kurd hatiye qonaxeke pir bilind. Dinya tev kurdan qebûl dike û wan wekî tirk, faris û ereb nabîne. Dizanî kurd ji bo azadiya xwe şer dîkin. Dîsa kurd di platformen navneteweyî de hatine naskirin. Mînak, Netewêne Yekbûyî çend caran li ser kurdan biryar girtine. Ji bo nasname, mafê mirovahiyê yê kurdan banga NY'ê heye. Her wiha her çiqas statûya kurdan ne wekî ya Yogoslawyayê be jî şerê ku li Kurdistanê didome, ji ya Yogoslawyayê tuntir û qirêjtir e. Em dixwazin dinya kurdan wekî teref bibîne. Wekî muxalifîn li dijî rejîmê ango wekî komeke etnîk nebîne.


Heger refîn penaberan bi vî awayî berê xwe bidin Ewrûpayê dê problemen bi ci rengî derkevin pêşberî welatên ewrûpi?

□ Tabî dewleta tirk li Başûr jî dek û dolaban li dar dixe. Iro dinya tev bi vê kiraya dewleta tirk dizane û hînek dewleti di vî warî de Tirkîye'yê tawanbar dîkin. Ev du û sê sal in dewleta tirk xebatê xwe li başûrê Kurdistan gur dike. Ji ber vê xebata şerê taybetî û mayîna wê ya li Başûr, kurdêne Başûr jî neçar dibin derkevin derve.

Çend planen dewleta tirk hene. Yek dixwaze Kurdistanê bêkurd bîhelê. Du, kîşeya kurd biavêje Ewrûpayê. Bi vê yekê dixwaze pergala Ewrûpayê xerab bike. Dewleten Ewrûpayê divê li dijî helwesta dewleta tirk rawestin, nexwe dê di pêşerojê de dewleten Ewrûpayê tûşî şertên dijî war werin.

Ya esas ne ew e ku dewleten Ewrûpayê hînek xwardin û hînek tiştîn din bidin kurdan. Divê kîşeya kurdan bi awayekî siyasi çareser bibe. Em naxwazin kurd jî welatê xwe derkevin. Bi her awayî problemen li welatê me çareser bîbin. Lî li Ewrûpa û cihîn din çareser nabin.

Ew problemen ku welatên Ewrûpayê lê rast werin, ci ne?



Li kampan cih, qedemgeh, xwarin û vexwarin kêm in û ne tendurist in.

□ Kurd naşîbin gelên din. Li welat û malên xwe mîvaniya xwe dizanîn, rez ji mîvanperveriya xelkê re digirin. Lî dê sosyaliteya Ewrûpayê xira bikin. Li Ewrûpayê jî bere bere bêkarî gur dibe, dewleten Ewrûpayê jî bere bere mafên sosyalî li ser gelên xwe kêm dîkin. Li her welatekî Ewrûpayê bi deh hezaran kurd hene. Ev kurdî han bi tevâhî nikarin xwe li civaka Ewrûpayê bînin. Taybetiyen kultura Ewrûpayê bi wan re tune ye, zû bi zû xwe li kultura Ewrûpayê nayîn. Pir kes li Ewrûpayê li ser çand û ola xwe dimînin. Heger em van taybetiyen kurdan bidin ber çavan, di pêşerojê de dê civaka Ewrûpayê ne jî hemdê xwe xerab bikin. Dewleten Ewrûpayê jî kurdîn ku nû diçin Ewrûpayê nikarin di mehekê ango du mehan de jî welatê xwe biajon. Her wiha divê mafê kurdan bidin wan. Di peymanen navneteweyî de hînek mafêne mirovahiyê jî bo mirovan hatine dayîn, kêm be jî dê bidin wan. Wextê mirov wan bide ber çavan, dê bere bere kurd pirtir koçî Ewrûpayê bibin û zêdetir li mafêne xwe xwedî derkevin. Lî di pêşerojê de dê mafêne xwe zêdetir bikin. Ew jî dê bide talûkeyeke mezin jî bo Ewrûpayê. Kurd sibê dê dibistanen bilind bixwazin, çiqas mafêne xwe binasîn dê zêdetir

KAMPA BERBAYIYAN: LAVRION

Tirkiye her ku di warê navneteweyî dîli onê dike. Bi pey ragihandina rayedarêne Tirkiye de militanen xwe. Ew kampa navborî, mexdûrên vê kampê piranî piştgiriya PKK dîkin. Li aliyê din her çiqas rayedarêne Yewnenîstanê ran nexweş e. Penaber zivistanê jî li hawî van kesan wekî penaber nahesibîne. Wej Seber xetereyê ye. Rewşa penaberan Lavrionê bilî Lavrionê li Yewnenîstanê çar kampêne penaberan Lavrionê, helwesta Tirkiye û welatê kiyeyê yê li ser penaberan ligel Serokê Bele a Kurdistanê yê Yewnanîstanê Hasan Özgür

bixwazin. Ev jî ne ji bo kurdan û ne ji bo Ewrûpayê riya çareseriyê ye.

Ez bawer im ger meseleye kurdan bê çareserkirin dê kurd ji Ewrûpayê veerin welatê xwe. Em kurd dixwazin li welatê xwe bijin. Welatê me têra me dike, her kes bi vê baş dizane. Yekîtiya Hiqûqnasen Kurdistanê jî ji bo vegere welat dixebe. Wisa diyar e ku kurd bo vegera welatê xwe amade ne.

Gelê Yewnan bi çavî li "mexdurên şer" dinêre?

□ Yewnan ji kurdan hez dîkin, baş fam dîkin û wan baş nas dîkin. Li tevahiya Ewrûpayê nijadperestî li dar e. Li Yewnenîstanê nijadperestî hêdî hêdî rû dide lê le hemberî arnavut, ereb û hwd. hin çalakî hatine li dar xistin. Lî belê di pêşerojê de dê ji kurdan re jî talûke bin.

Heta iro Yewnenîstanê bi dilgermî li kurdan nihîertiye. Dibe ku du sibê Yewnenîstan jî kurdan qebûl neke. Lî ya rastir, gelê yewnan ji kurdan pir hez dike. Hema bêje gelê yewnan van mexdurên şer xwedî dike. Xwarin, cil û bergen dide wan.

Wekî gotina dawî....

□ Bi taybetî banga me bo gelê me yê ku li metropolan e. Bila kurd li ser dek û dolaban dewleta tirk hisyar û agahdar bibin. Jiyana li Ewrûpayê ne tu jiyan e. Mirov çiqas nêzî welat be, ewqas çêtir e.



"Bila kurd li ser

tiya penaberiyê:

Lavrionê

✓ Dewleta Tirk li ser Kampa Lavrionê derewan dike. Gerîlayên PKK li Kampa Lavrionê perwerdehiya leşkerî û siyasi nabînin. Li Kampa Lavrionê, penaberên kurd ên ku dewleta tirk gundê wan şewitandiye, hene. Jin û zarokê wan hene. Kamp jî her kesî re vekirî ye û her kes bi vê yekê dizane.

Serokê Belediyaya Lavrionê Papastavzo Poulos:

Divê Kurdistana kurdan azad be

eli pêşberî Yewnenîstanê tengav dibe, behsa Kampa Lavrionê , PKK li vê kampê perwerdehiya siyasî û leşkerî di- exdurêن şerî li Kurdistanê dihewîne. Ji ber vê yekê penaberînê li rewşa penaberên kampê dipirsin jî, rewşa penaberînê ingehêن xwendekaran dimînin. Tişte balkêş, Yewnenîstan li Serokê Belediyayê Lavrionê jî dibêje, jiyanâ penaberan li nê her wiha encama penaberbûnê jî baş dide xuyakirin. Ji penaberan hene. Hevalê me S.S. DILPOLO li ser rewşa penatêن Ewrûpayê, problemen ku dê rû bidin, politikayên Belediyaya Lavrionê Papastavzo Poulos û Nûnerê Heyva Sor gür axivî.

Di van du salêن dawî de dewleta Tirk bi keştiyan kurdan bi ser we de dişine. Hûn vê yekê çawa pêşwazî dikin?

□ Bi taybetî em binecîhêن Lavrionê dixwazin alîkariya penaberan bikin. Lê li navçeya me kar peyda nabin û penaber bêkar dimînin. Ev dike ku aloziya aborî derkeve holê. Hejmara penaberan geleki ji me zêde ye. Di warê tendirustî û perwerdehiyê de problemen penaberan hene. Hinek kampan me bo havînê ne, lê ji bêgaviyê, pena-

berên kurd ên ku mexdûren şer in, zivistanê jî li van kampan dimînin. Bêxwarin dimînin, bê-agir û ardûne, bêmal in. Heta penaberên bêçadir û kon jî gelek in. Jiyanâ wan di xetereyê de ye.

Li Lavrion û Yewnenîstanê, bi her awayî em dixwazin alîkariya gelê kurd bikin. Gelê kurd birayê me ye.



Lavrion navçeyeke biçük e. Ji ber ku navçeyeke tûrîstîk e, hebûna kampan zêde guncaw nayê dîtin.

Tirkîyeyê bi zanabûn kurdan bi ser we de dişine. Di pêşerojê de ew pêla derbederiye dê ci probleman durist bike?

□ Ev problem ne tenê ya me ye, ya hemû welatêن Yekîtiya Ewrûpayê (YE) ye. Divê hemû welatêن Yekîtiya Ewrûpayê li dijî vê kiryara Tirkîyeyê pest û zora xwe deynin ser Tirkîyeyê, ku kurd mafê xwe yê meşrû, azadiya xwe wergirin. Divê Kurdistana kurdan azad be. Ewrûpa û Yekîtiya Ewrûpayê divê li dijî şewitandin û valakirina gundêن kurdan derkeve û qırkirina li ser gelê kurd bidin sekinandin.

Çar hezar kurd ji neçarî hatine Yewnenîstanê. Hûn dê bikaribin pêdiviyên wan peyda bikin?

□ Ev karê dewletê ye ku, li gorî imkânên xwe wan bi cih bike, ji bo wan kar peyda bike. Lê rewşa aborî ya Yewnenîstanê ne baş e. Lewre pê nikare.

Penaberên li Lavrionê ci astengî û probleman ji we re derdixin?

□ Penaberên li Lavrionê ji me re tu probleman durist nakin. Em ji gelê kurd geleki hez dikin. Li deverina hinek dizîyên biçük derdi Kevin, wekî destdrêjîyên xwarin, sebze û fêkiyan. Ez bi xwe jî bi malbat û ligel 5-6 zarokan li welatekî bîyan bûma û zarokê min birçî bimana, min jî dê ji bo zarokê xwe destdirêjî bikiya. Em vê wekî diziyê nepejîrinin. Heger

kirin, çavkaniya teşwîqê em in, em bi nebûne alîkar.

Gelek caran dewleta Tirk dibêje ku, gerîlayên PKK'ê li Lavrionê perwerdehiya leşkerî û siyasi dibînin. Tiştekî wiha heye?

□ Dewleta Tirk derewan dike. Tiştekî wîsa tune ye. Li Kampa Lavrionê penaberên kurd, ên ku dewleta tirk gundê wan şewitandiye, hene. Jin û zarokê wan hene. Kamp jî her kesî re vekirî ye û her kes bi vê yekê dizane.

Binecîhêن Lavrionê li ser penaberan gîlî û gazincêن çawa dikin?

□ Ta niha min der barê penaberan de ji rûnişvanêن Lavrionê tu gîlî nebîhistine. Gelê navçeya Lavrionê penaberan bi evîn û rûkenî diezimîne û tim alîkariya wan dike. Nérîna gelê Lavrionê ew e ku, divê li seranserî Yewnenîstanê ji bo penaberan alîkari bê kirin.

Li ber guhêن me ket ku dê Kampa Lavrionê were girtin. Gelo rast e?

□ Na. Bes di pêşerojê de mimkûn e. Ji ber ku dema Kampa Lavrionê hate avakîrin, Lavrion zehf biçük bû. Niha Lavrion pir mezin bûye û kamp di nava navenda navçeyê de maye. Wekî din jî, Lavrion navçeyeke turîstîk e. Penaber û turîst di nav hev de nabin.



er dek û dolaban dewleta tirk hişyar bibin. Jiyanâ li Ewrûpayê ne tu jiyan e. Mirov çiqas nêzî welat be, ewqas çêtir e."

Çend helbest ji 'aliyê din'

Rûpelê dawiyê ji çerxê Kurdîniyê

"Wezê di derzeke dîwarê Kela
AMED'ê de, di şikestinê ser û çavêne
te de, peqên destêne te de, di raz û
nepeniyêne cergê te de, di rojêne dawiyê
ji jîna te ya
bêrûmet de, winda bûme û rûpelêne
dawiyê ji vî çerxî dixwînim."

1)
Heyyy pîrê
ji emrê te borîn sed sal iû
carek negirnijî
her pênc salan
carekê heldiweşî
dibohîjî
li emrê te bû êvar
carekê xurt nemeşiyayî
mîna stêrkan, carekê tu neriji!!
hezar biharênen....
binefşoka mîra evînê
nêrgizêne avdayî bi xwînê
di réça te de winda kirin

2)
hezar, karwanêne perwane
û belatînkan û hespêne komêd
mahînêne kehêl...


me dane rê
da tu bîjî
heyyy pîrê

ev ci destêne qirêjî ne
ketine ser bedenê te
ev ci lêvîn qeşavî ne
tu metî
cîlnivêşka te
bi piyan çûne ser
karê te kiriye fihêtî
heyyy pîrê
çêndî min li bîrê
her ji zarokî heya iro
li nav koma hevalan
her tu ya kirêt i
dêê... binêre
ava jiyanê li bin pêne ser hilda
li welati kanika wê za
bêje dewr û beran
dar û beran têwer nekin
yê tawî

yê paşveman rêka wî
yê mirin mîhvanê wî
bila çengêkî jê vexwit
çavêne xwe pê bişut
tev tişt dê xwe nû kin
av dê vegeŕite ve ser aşı

(3)

û tev tiştên neliv
dê bine jiyan
namîne pîratî
werin ji jiyanê dest pê bikin
û bi jiyanê dawî bînîn
kesayetiya te winda ye, lê bigere da ku
bibînî
rûmeta te li bin solêne dagîkeran e,
ew welatê te bi xîvetekê diriyayî
guhertî...
binêre destmaleke li nav destêne



bêrûmetan,
li çiyâyen enîspî û sîngfîreh
li zinarêne bejinbilind, gul û kulîlk ji
serman de
di ser nixûn in....!
hey pîrê
çêndî min li bîrê
ji rûkêne te gul nabişkîvin
ji porê te
dav nakevine semayê
perçem nalîvin
ji rûmeta te, tu tişt
Kubar nîn e bi tenê difin
difin bilind ji
ne layiqî ser û sîmayêne te ye
dest û pêne te, şelel tê de ye
nêrîna te nêzîk e
bi tenê
ber pêne xwe dibînî
çavêne te
bo asoyeke dûr
...dûr nabîzîvin
Hey Pîrê
(4)
divê vê carê
kerem bike xwe biçemînî
şopa xwe ya kevin baş bixwînî
paşî vexwî ava jiyanê
da ku "Besa Dêrsimî" bigehît "Seîd
Rezayî"
hêşta ji tînê nemirî
Leyla Qasim
berbûka herdu zavan
Mame Rîse... Mehmud Ezidi
Hêşte di hespî de nefîri
Berîtan û Berîvan
xenayê bişêlin
hêşta Mazlum Doğan

ji şerşoyê li gel hevalan, nevegerî
nezivirî
pîra minê, pîra evro keçka sibe
divêtin yan xwe nû kî bîjî, bîjî
yan dehmana xwe hildî
li nexşeya cîhanê
bi yekcarî nemînî, bifîrî
li nexşeya cîhanê
Bi yekcarî nemînî, bimîrî

NECÎB BALAYÎ

Herac herac

Herac, herac...
Xwêne be herzan
Firmesk her be nirxî aw e!
Ême le ser sefer in û
Xak efroşîn
Zêrî rût e, nezîx û berd
kê pûldar e ?!
Werin bikirin
Xakî sewiztan dewî, ya zerd ?!
Awir bo diwa medenewe
Ew cencal e, xelkî kurd e
Le ser gorî şehîdanîyan şîwen eken
Dilteng mebin
Giwê medene hat û hawar
Tûr be pir ken !
Hemû pûlî qebûl ekeyn :
Dînar, timen, lîra, dolar !

Ême qayd û raber in
Dûberanî şerengêzî beramber in !
Mêjû geway xebatmane
Çiman nekird?!

Patextekânî dînyaman
Bo rizgarî gel dapawê

Kê berkêman, le dinya da dengî dawe

Maçî kêman nekir, bîlêyn
Kes mawe ?!

* * *

Herac, herac
Kurd efroşîn!
Hemû palewan û cengî,
Wek debabe,
-Çomaq, şeqo, xencer, tifeng-
Pulan, berdin!
Le beramber dujmin, merd in!
Belam bawî dilî êwen
Sawilken û zû exlet in!
Eme çarenûsi kurd e
Mêjünûsan selmandûyane, kurd û
ceng!

Herac, herac
Kê kiryar e ?!
Kurdistan milki xoman e
Dilarî bab û bapîrman e
Le Zêbar û Berzanewe
Ta Şarezûr, Germiyan û Xirî û
Nawzeng!
Herac, herac
kê kiryar e ?!
Werin ewro xak efroşîn
Firmesk her be nirxî aw e
Xwêne be herzan!
Şoriş ekeyn be qurbanî karxanekanî
Stenbol
Sozaniyekanî London û Parîs û Bonn
Zor giran in!
Debê tifengekanîşman
Bifroşîn û bikeyn be pûl
Herac....herac
Kê kiryar e ? Kurd efroşîn!

CELAL MELEKŞAH

Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● 01 gelawej 1998 şemf:

Konsera Koma Agirê jiyan,
saet:15.00

● 02 gelawej 1998 yekşem:

Konsera Koma Avreş,
saet:15:00

Koma mûzika Koma Avreş, komeke Navenda Çanda Mezopotam ya şaxa
Amedê ye.

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



● 07 gelawej 1998 în:

Film: Dilér (Cesur Yürek)

Derhêner: Mel Gibson

Li Navenda Çanda Alternatifê

● 5 gelawej 1998: Pêşkêşkirina film:

"Winda" Yön: Costa Gavras

Saat: 18.00

Ji bo Yüce û Beygeldi mewlûd hate dayîn



Sema Yüce



Fikri Baygeldi

BIYOGRAFIYA 3 SALAN

Pêşî ez li Birkê, Pîran, Tawsî hîn bûm êşa mirinê
Min ji dûr ve guhdarî kir

Li lehengiya Genco, Sabrî ú Mazlûm
Min nekarî bilezînim, bipêçim birînén wan
Min nekarî sil bikim lêvén wan ên zuwabûyî

Dûv re min ji axîna milîsekî bîhist

Diruşma "Şehîdîn Bîrke bêmirin in." (Sema Yüce 1993 Girtîgeha Newşehîrê)

Ji bo bîranîna şehîdîn Newrozê Sema Yüce û Fikri Baygeldi li TAYD-DER a Îzmîrû mîrê Mewlûdeh hate xwandin.

Roja 28'ê tîrmehê li TAYD-DER a Îzmîrû mewlûda ji bo şehîd Sema Yüce û Fikri Baygeldi hat xwendin. Çalakiya ku li TAYD-DER'ê dest pê kir, piştî beşa yekemîn, beşa duyemîn le NÇM'ê berdewam kir. Nêzî sed û pêncî kesî besdarî vê çalakiyê bûn. Çalakiya mewlûdê ji bo şehîdîn şoreşê bi deqîqeyek rawestîna rîzgirtinê dest pê kir û bi ahaftina Serokê TAYD-DER'ê vebû. Serokê TAYD-DER'ê Şehmûs Akgül di ahaftina xwe de wiha got: "Hewce ye em li bîranîn û mîrasa şehîdan xwedî derkevin, pê ve girêdayî bin. Em sozê didin em ê her dem doza wan bîdomînin û layiqî wan bin." Piştî ahaftina Akgül, mewlûd hat xwendin. Di beşa duyemîn ku li NÇM'ê berdewam kir de, kasetta dengê wan tê de hate pêşkêşkirin. Piştî ku Sema Yüce çalakî pêk anîbû, Fikri Baygeldi ji bo bîranîna

wê stranênu ku wê ji wan hez dikir gotibû û dengê xwe xistibû kasetê. Dîsa Sema Yüce jî stranek bi navê 'ez bi zorê teslim nabim' xistibû kasetê. Kaset bi çepik û tililiyên dayikan hatin pêşwazîkirin. Her wiha helbesta ku Sema Yüce di sala 1993'yan de li Girtîgeha Nevşehîrê nivîsibû, ji aliyê koma NÇM'ya Îzmîrê, Şanoya Hêvî ve hate pêşkêşkirin.


Di berdewama çalakiyê de, komên mûzîkî yên NÇM'ya Îzmîrê stranênu ku Sema û Fikri jê hes dikirin weki 'Şehîd namirin', 'Tu kulîlka azâdiyê', 'Rojbaş Gerîla', 'Berxwedan xweş doz e', ûwd. pêşkêş kirin.

Li aliyê din, roja 18'ê tîrmehê wesiyeta Sema Yüce hat bicihanîn. Yüce di wesiyeta xwe de wiha gotibû: "Kulmek axa li ser mezelê min deynin ser mezelê hevrê Zekiye". Di bicihanîna wesiyeta Yüce de saziyên welatparêz cih girtibûn.

HAVA OKAN/ÎZMİR

TÎŞK

Aştî le Başûr



BEKİR ŞIWANÎ


Seranî Yekêtî Kurdistan YNK û Partî Dîmokratî Kurdistan PDK, diway çendin xulî şerî nawxo le başûrî Kurdistan, seratay em emsal, le hewlêk da bo diwayî hênan be kêsekekan û dananî sinûrêk bo ew şerey ke herêkemekey wêran kirdiwe, çend nameyekî aştî amêziyan bo yekdî nard.

Herdû layen, paş ewey geyştine ew bawerey ke hîç layenê natwanê layenekey tir be hêzî serbazî bixate lawe, naçar bûn giwê bo dengî hoşmendî rabigirin û hewlêk biden çîtir Kurdistan be agirî şerî nawxowe nesûtînen. Herçende herdû layen le mangî nîsanî(avrî) rabûrduwe be serpereşti sekretêri pêşûy Partî Komonîstî Iraq PKI, Ezîz Muhemed, destiyan be danûsan kird, belam be hoy dest têwerdanî hêzakanî derewe û hawkarî rastewxoy PDK legel dewletê tirk, dîdarekanî aştî pêşkewtinî be xowe nedî. Dekrê biwitîre ke Ankara rolêkî diyarı heye le tegere xistine ser rîy pêkhênanî aştî le Başûr. Em rastiye çend carêk le layen lêpirsrawanî YNK'we bas kiraw. Turkiye be biyanû hebûnî gerîlakanî Partî Kirêkanî Kurdistan PKK le herêmeke, be şeweyekî tirsinak destî xistote karûbarî nawxoy xwarûy Kurdistanewê.

Le rastî da amancî dewletî tirk le herêmeke, le pelamardanî gerîlakanî PKK gewretir e, wek debînre Ankara le êstawe kewtote kar bo gorînî rastî dîmografi herêmeke û be hemû şeweyek hewl dedat jimarey turkman ziyad bikat û heman kat hewl dedat şîrazey birayetî çendin sedsaley kurd û turkman bişewênenê û ew du gele bikat be dujminî yektit. Eme seray xewnî le mîjîney dewletî turk bo destgirtin be ser serçawekanî petrol da le Kerkük û Mosul. Ca lew boçûnewe ke dewletî tirk dij be sercemî bizût-newey azadîxwazî gelî kurd e, eger hêzakanî kurd helwêstî xoyan yet nexen û nakokiyekan nexene lawe, awa bawer nakrê Ankara rê be dûbare bûnewey ezmûnî helbijardinekanî başûrî Kurdistan bidat. Dekrê biwitîre le ber gûşarî dewletî turk e ke herdû layen natwanîn le ser damezrandinî hukûmetêkî hawbeş ke gel berew helbijardinêkî giştî berê rêk nakewin. Le ber eweş ke Washington le çawîlkey Ankara'we bo kêsey başûrî Kurdistan derwanê, dîsan eger kurd xawenî biryarî xoyan nebin, ewa ûmîdî zor le hewlekanî Amerîkaş nakrê. Lî ber ewey Amîka nek derheq be Kurdistan, belkû derheq be Iraqîş siyasetêkî rûn û aşkray niye.

Eme cige lewey ke Washington û Ankara le nawbirdinî şorîş Bakûr da be tîrör yek degirnewe. Boye dîsan dêmewe aslî mexsed û delêm heta layene kurdiyekan hendê kot û zincirî pabendî be hêzakanî derewe nepirsênen, be taybet PDK legel Turkiye, mehal e aştî le Kurdistan seqamgîr bê.

"Zarok fêkiyên malê ne"
(Gotina pêşîyan)



Hevalên heja, merheba ji we hemûyan re; kesên ku dizanin vê rûpelê bixwînin an jî ji kesekî/e din guhdarî dîkin. Em vê hefteyê helbesta çirçirok û morîstanê ku Adar Jiyan ji bo we nivîsiye pêşkêşî we dîkin. Her wiha ji bo kesên ku bixwazin merîvîn xwe nas bikin dîsa hevalê Jiyan bi helbestekê danasîna malbatê dike. Em wê jî pêşkêşî we dîkin. Ez bawer im hûn dê kêfxweş bibin.

Wekî em her car dibêjin, Azadiya Welat Yarîgeha Zarokan li benda name, faks û telefonên we ye.

Heya bihevrebûneke din bimînin di xweşiyê de

HEVALA WE RÜBAR



Çirçirok û moristan

Rûniştibû tim çirçirokê tenbûrvan
Ne hat hişê wî ne nan û ne arvan
Havîna gewr gelek xweş bû li ba wî
Berf û baran tu car nehat bîra wî
Cîrana wî dixebeitî moristan
Bêrawestin dîkir karê zivistan
Qet rûnenişt diçû-dihat roj û şev
Ceh ú genim, nîsk û garis da ber hev
Hê ku berî bibare berf û baran
Qûte salê kişand devê kewaran
Ku çirçirok wê rewşa wê dibîne
Dibêje: Ev moristan çiqas dîn e
Dixebite vê kelgerma havînê
Dişewite li ber tav û rivînê
Suya darê çiqas xweş û hênik e
Ez rûdinim, ew jî her roj kar dike
Çirçiroko pişta xwe daye darê
Dibê qey xwarin ji ezman tê xwarê
Nizane ku gava zivistan were

Dê ji néza ew li parsê bigere
Bi şev bi roj li tenbûra xwe dida
Kar nekir got: 'Rizqê min jî li xuda'
Ku payiz hat pelê daran weşîyan
Dest û ling tev ji ser xakê kişiyan
Ketin xewa zivistanê mişk û mar
Moristanê bi kêt qutê xwe dixwar
Pir birçî ma ew, çirçirokê lewaz
Bê nan û av rût û tazî, belengaz
Hate bîra wî ew rojê havînê
Got "Moristan xwarin dibir hêlinê
Havîna çû dagirt tûr û ferdê xwe
Ka ez herim jê re bêjim derdê xwe
Bila bi deyn hînek xwarin bide min
Ji bilî wê get nas nakim kesen din"
Sar û seqem ji birçîna lerîzi
Poşman bûbû jî xwe re got bi dizi:
"Xwezi min jî ber hev bikira hînek qût
Bo ku iro ez nebûma wilo rût"

Merivêñ min kî ne?

Pêşî hene du heb nav
Pir hez dikim ez ji wan
Yek jê dayik, yek jê bav
Jiyan nabe bêyî wan

Navê kekê min Xebat
Şer dike ji bo welat
Navê xuşka min Xelat
Ser bilid im ez bi wan

Birayê bav e apê min
Kekê dayê xalê min
Du pîrik, du kalê min
EZ dibim nevîyê wan

Hinek Jin in, hin keçik
Keçmal, xaltîk û metik
Jinbira min ya xweşik
Jinap, jinxal hê ciwan

Keça bira birazî
Kurê xuşka min xwarzî
Bijînin bi serfirazî
Daxwaza min ji bo wan

Keça ap e tim dotmam
Kurê ap dibe pismam
Merivêñ min bûn temam
Ji bîr nakim navêñ wan

Dê û bav: Yêñ ku bûne sedema çêbûna me em anîne dinê.

Dê: Jin

Bav: Mêr

Kalik: bavê bav, an bavê dê

Bapîr: Bavê bavê mirov

Dapîr: Diya bavê mirov

Pîrik: Diya diya mirov an diya bavê mirov

Bira: Yêñ ku ji dê û bavekîne (mîr)

Xuşk: Yêñ ku ji dê û bavekîne (jin)

Ap: Birayê bavê mirov

Xal: Birayê diya mirov

Metik: Xuşka bavê mirov

Xaltîk: Xuşka diya mirov

Jinbira: Jina birayê mirov

Jinap: Jina apê mirov

Jinxal: Jina xalê mirov

Jinbav: Jina bavê mirov (lêne diya mirov)

Keçmal: Xuşka mîrê jinê

Bixaltî: Keç û kurê xaltîka mirov


Dotmam: Keça apê mirov

Pismam: Kurê apê mirov

Xwarzî: Kurê/keça xuşka mirov

Birazî: Keça/kurê birayê mirov

Nevî: Kurê/keça mirov an kurê/keça keça mirov



Da xwe rabû derî bi derî geriya
Çû li ber moristanê pir geriya
Got: "Ji bo Xwedê iro mame bê nan
Bi deynê xwe bide min çend heb zîwan
Moristanê got: Te havînê çi dikir?
Ez xebitîm te qeşmerî bi min dikir
Çirçirok bersiv da stûyê xwe xwar kir
Min li saz da, lê havînê te kar kir
Moristanê got: "Yê havînê neke kar
Dê çile, ew ji qût bimîne bê par

Ku ez iro hînek xwarin bidime te
Tu car kar û xebat nayê bîra te
Yê ku havînê neke kar û cefê
Zivistanê qet nake kêt û sefê
Ji ber ku te tu car tab neda xwe
Ez jî iro qet nadem te keda xwe
Tu parsek i ez geza nan nadem te
Qey ku ew hişê te were serê te!

ADAR JIYAN

Pirtûkeke Vederbûyî:

ALAN OSMAN

DERDO

HELBEST

Bêrûd, ji mêt ve ji bo kurdan navendeke çalakiyên ronakbîrî û siyasî ye. Gelek ronakbîrîn kurd li vî bajarı bi karûbarê ronakbîrî rabûne. Ji van kesan mînaka berbiçavtîrîn Kamuran Bedirxan e. Îro jî gelek ronakbîrîn kurd ligel astengiyên dijwar, li Bêrûdê bi heman karî radibin. Wekî mînak kovara Sorgul, ku bi erebî tê weşandin, dengê kurdê Lubnanê ye.

Alan Osman jî, ku heta îro gelek pirtûkîn vî çap bûne, karûbarê xwe yên

ronakbîrî li Bêrûdê didomîne. Vê dawiyê pirtûka helbestan a Alan Osman, ku bi navê "Derdo" ye, gîhişte ber destê me. Pirtûk di nava sala 1995'an de hatiye belavkirin û ji 80 rûpelan pêk tê. Di pirtûkê de 33 helbest cih digirin. Alan Osman, helbesten xwe bêhtir bi şewaza serbest ristine. Pirtûk, diyarı şehîdîn Kurdistanê hatiye kirin. Heya îro çar pirtûkîn Alan Osman hatine weşandin.

Di naveroka helbesten Osman de, mijarêne wekî bêriya welêt, şehîd, bêsi-üdiya kurdan, tesîra mîtin-geriyê, evîndarî, durûtiya welatên cînar û misilmantiyê berbiçav dibin. Li aliye din di helbesten Alan Osman de taybetmendiya herî diyar, tesîra rîbaza Surrealîzmê ye. Wekî mînak beşek ji helbesta Derdo:

*...lo derdo me déran û me déran
bênderên bawerîyan
li ber bayê xerdelê
li ber bahozên jehrî
em didérin û me déran*

Di helbesten Alan Osman de durûtiya welatên misilman cihekî girîng digire. Ev yek di helbesta bi navê "Islam" de xweş hatiye lihevanîn:

*eger pêlavêne pêxwaseki
eger şûrê kuştareki
egerên diravêne belaseki
li Mekeyê bê dizin
destê dizek dê jê bibe.*

*lê gelo gelo
eger welitekî dagirkirî
eger aştiyekî zincirkirî
eger namûseke berbatkirî
li gora destûren misilmanan
hatibin xistin bin talanan
ku qîr bikin dadweriyê
ji bo tol û rizgariyê
lo kurdê lê kurdê
em dê çi bikin
çi bikin!?*

Her çiqas Alan Osman di warê zimên de şareza be jî, lê di warê lihevanîna helbeste de hin kêmasyiyê wî rû didin. Wekî mînak di hin helbesten de dubare pir in. Vê yekê jî şahîkî û rawaniyê helbeste kêm kiriye. Wekî mînak di helbesta Derdo de ev kêmâsi diyar e.


Alan Osman, li ser evîn û hezkiri-na welêt jî helbest restine:

*bes tenê ji te re
lêvén min bendewar in
ey girnjîma li malzaroka héviya avis
di giréké de
di qaliké héké de
tu hatiyî-
guvaştin-----peçandin?
ji canêñ kuştîyan
ji xewnêñ birçîyan
ji hêrsêñ sêwîyan
tu hatiyî-
veristin-----hûnandin?
ez jî yekî evîndar im
ji te re ez bendewar im
ey destpêka kenê min
û girnjîma
ji pênc xwinan saz dibe
û ken
ji pênc girnjînan endaz dibe
êdi bes e de were
lêv qerimîn ji te re
çav werimîn bi te re
ey destpêka kenê min
kedera min-----jêderâ min*

MAZLÜM EŞREF

Morîka xewê, Mehsûm û Lozan

HASAN KAYA



Cend caran min ji zarokên ku li nav goristanê dilistîn re gotibû, morîka xewê ji guhê miriyân dergexin, bila bimvin. Lî ew li welatê xewê tu caran nebûne xwediyê xeweke giran. Ez êdî nikarim li nav wê goristanê, ji van zarokan re bibêjim, hûş bin û rehet rûnin. Êdî niha ev zarok, di kuçeyên Mersînê de, li varoşen Stenbolê desmal û benîstan difiroşin. Bi dengê xwe yê ketî ava bûzê difiroşin. Belkî careke din ew mirî dengê wan zarokan nebibîzin û ew mirî heta hetayê çav-vekirî li benda dengê solêñ zarokên bê tebat bin.

Desten dayikên ku tenûr vêdixistin a niha ji bo du nanê firûnê keftûleftê dikin. Wan destan di gelek serhildanan de, pêçiyên xwe ji hev vekiribûn û işareta serkeftinê çêkiribûn. Çepik kutabûn ji fermadarê gerîlare ku di şahiya Newrozê de bi coş axivibû. Gelek gerîla di nav wê goristanê de veşartî ne. Dayika ku her tim

tenûr vêdixistin, mîna zarokên xwe ji wan şervanan hez dikir. Gelo niha riya tu mirovan bi wî gundî dikeve, miriyên wî gundî heta kengî dê bi tenê bin? Ez jî nizanim!

Me bi hev re dest bi dibistanê kir. Dema ku me solê reş ên lastîkî kirine piyê xwe, pêşmalka reş û berstîka spî me da ber xwe û tûrikê xwe kire destê xwe û me riya dibistanê girt. Aliyekî dilê me kîfeke pir xweş, aliyekî dilê me jî tirseke mezin vedi-hewand. Li hewşa dibistanê, me tevî gelek hevalên xwe gelek lîstik lîstîn; çirê, gog, çavgirtonek û hwd.

Li taxê jî ez û Mehsûm bi hev re bûn. Taximê me yê futbolê hebû. Di kolan û holê bi ax û xwelî de, ji sibehê heta êvarî me bi gogê dilîst. Dest û rûyê me tev dibû birîn.

Ji bo ku em heqê çûna sînemeyê derxin û li filmê Yılmaz Güney temâse bikin, me hesin, birxo û têl ji ber deriyê hedad û hostayê texsî û qamyonan berhev dikirin û difirotin. Dawî Mehsûm mezin bû û xwe, netewya xwe, welatê xwe nas kir. Beşdarî nav refen bazen azadiyê bû. Di biçûkatiya xwe de jî mîna bazekî bû. Jîr, çalak û jêhatî bû. Ewqasî laşê xwe hîn kiribû, her cureyên

teqleyan diavêt. Laşê wî bûbû mîna lastîkê. Ez bawer im ku li serê wan çiyayê asê jî ew qasî jêhatîbû. Dawiya dawî Mehsûm li Bagokê kete nav refen şehîdan. Niha ew teyrikek e, di cenetê de.

Ev her du dîmenê jorîn li ber çavê min in. Dîmenê Mehsûm û yê wî gundê ku hatiye sotin. Ez li nûçeyen salvegera Peymana Lozanê rast têm. Li Lozanê, heftê û pênc sal berê, di meha tîrmehê de, çarenûsa gelê kurd careke din bi pênuşa dijminê kurdan û hevalbendên wan hate nivîsin. Wê demê xwediyê kurdan tunebûn. Rêber û rexistinê wan tunebûn. Ên ku hebûn jî qels û kêm bûn. Ji ber wê yekê ye, ku berdêlîn giran têne dayin.

Di dibistana ewil de, heta ku Mehsûm xalêñ peymana Lozanê jî ber dikirin gelek lêdan dixwar. Lî ji bo ku çarenûsa gelê kurd were guhartin, ji bo ku Peymana Lozanê jî nû ve were nivîsin Mehsûm bû teyrikê cenetê, bû berdêla rastkirina çewtiyekê. Dibe ku dayîka tenûrvan navê Lozanê nebihîstibe, lê ew jî bi çarenûsa xwe nerazîbû û ji bo ku biguhere têdikoşî. Kirasê teng ê Lozanê bi destê Mehsûm, bi destê wan zarokên avfiroş û wê dayîka tenûrvan tê çirandin.

Ya Şêx Badîn

Li Amedê êla Badikan heye. Her sal diçin hêla Mûşê, zozanan. Rêka wan, di navçeya Pasûrê, di Kendalê Hêşîn re derbas dibe. Lé di Kendalê Hêşîn de neqebek heye, pir asê ye. Bi kotevê mirov dikare bi rêtê tê re derbas bibe. Barê mirov jî hebe, encax hêstir dikarin bibin. Dîsa wexta zozana hat. Badikî haziriya xwe dîkin, bar û berxanên xwe tevî hev dîkin û ew ê hezin zozana. Nûro, ci di malê wî de heye li hêstira xwe dike. Jixwe yekî xizan e, zêde tiştêkî wî jî tune ye. Li mala wî ci heye, ew ê ku li ser hêstirê ye.

Rêwiyê zozanê Şînê tê Kendalê Hêşîn. Yeko yeko barê xwe derbas dîkin. Dor tê ser Nûro. Nûro hefsarê hêstirê xwe digire û dikişine. Di nav neqebê de lingê hêstirê wî dişemite, hêstir ber bi biniya neqebê ve gêr dibe. Nûro bala xwe dayê ku mal, milk ci heye tevî hêstirê diçe. Di cih de şêxê Nûro Şêx Badîn dikeve bîra Nûro û gazî dike: "Ya Şêx Badîn tu destê xwe bidî ber, tu li min bêyi rehmê, ezê qurbanekî li ser rêka te şer jê bikim." Nûro dînihêre ku gaziya wê tewş e, vê neqlê dilê wî bi şêxê wî dişewite û dibêje: "Qene bila Şêx di bin barê hêstirê de nemîne û dike gazî: "Şêx Bado xwe bide alî, kuro Bado xwe bide alî hêstir û bar bi ser te de tê."

Berhevkar: ÇIYA MAZÎ

Çar û çar

Li Iraqê du gund cîranê hev bûn. Yek gundê ereban bû û yet gundê kurdan bû. Ew her du gund her dem neyarê hev bûn. Dema wextê dûrînê (çandinê) tê, kurd tev diçin dûrînê. Ji ber wê, gundê ereban êrîşî ser gundê kurdan dîkin. Di gundê kurdan de tenê çar mîrxas mabûn û bi ereban re dikevin şer. Şerekî pir giran çedîbe. Evarê şer diqede, tev dizi virin gundê xwe. Kalê wan pirs dike, we ci kir? Serokleskerê ereban bersivê dide û dibêje: "Dema em çûn şer, em cil û çar, ew çar kes bûn. Me ji wan kuştin, wan ji me, me ji wan, wan ji me kuştin û gava şer qediya em man çar, ew man çar."

Berhevkar: SAIT ELCİ

Pito lî lî lî

Li Badika di gundekî de mirovêki bi navê Elo hebû. Jina Elo ducanî bû. Li ber zarok anînê bû. Rojekê jana wê dest pê dike. Lé belê pir bi zehmet e. Pîrejinê gund tev lê têne hev û du, lê jina Elo nawelide. Du roj, sê rojan ev rewş dom dike. Elo lê dînihêre dê jînik bimire, radibe diçe cem axayê xwe. Dibêje: "Axa-



yê min eger destûra te hebe, ez ê jina xwe bibim Farqînê, nexweşxaneyê."

Axa dibêje: "Lawo tu hem feqîr i, hem jî kîmaqîl i. Emê li vir jina te sax bikin."

Elo dibêje: "Axayê min, iro sê roj in, temamê jînê gund dîkin nakin, ev wê led nawelide. Pir inatres e. Tu yê çawa bikî?"

Axa dibêje: "Lawo ew sebî ye, ji ci hez dike?" deng ji Elo der nayê axa bersiva xwe dide: "Zarok ji ci hez dike, ji xire xirê. Rabe deh pazdeh heb gûzan bike nav bêjingê, bêjingê bikeline. Hêdi hêdi here li ber lingê jina xwe rûne û dîsa bêjingê bikeline. Wê gûz bikin xire xir. Tu jî tim bang bike bêje: 'Pito lî lî lî, pito lî lî lî.' Tu wê wextê bala xwe bide, wê pito çawa bazde derva ku bi gû-

zan bilîze."

Berhevkar: ÇIYA AMEDÎ

Diz

Du heval li ber siya darekê rûniştibûn û derdê hev û din dihejandin. Yekî pirsî:

- Bira tu çîma wisan mehzun i?
- Wê rojê diz ketibûn mala me.
- Wax, wax, wax! Nexwe tu ji ber vê xemgîn i?
- Na, ne ji ber vê.
- Nexwe ji ber ci xemgîn i?
- Ji ber halê diz ez xemgîn im.
- Mirov ji ber diz xemgîn dibe?
- Erê wele mirov dibe. Lewre pîreka min gotiye qey ê diz ez im.

Berhevkar: HISEYNÊ İZARÎ


BI XELAT...

XACEPIRSA BI XELAT (131)

XACEPIRSA

Kurd Selîdek	Dengdare n 'Défens' Nasurîn	B	Tugayîk Hîsk	E	Pîeti	B	Tipek Kurdî Niveki Jîman	W	Fuyretta Alburuya
S	I	D	D	I	K	T	A	N	Wekl. Fenn
Sirûd									T
Dîberê	M A R S		İstekler bir dîberê wan	A R	A M				
Sîn	I N	K	S	L	I R				
Zînar	L A T	N	Jî. adan	Z A N A	N A N				
Sembolik Ostendene	S I N A N		Xarçeske targhez fazilek alimanî						
Hesîrat Rêzînîz Nîşîkara	B I R A N	N							
P	E N		Dîberet direj	X	V A				
Qetek Perçelik	N		Tipe pişti	I N	Tipe dowm	2			
T	I S	R O C	Rudefa remesne						
FEYVA VEŞARI									

Bersiva Xacepirsa 129'an



Xacepirsa me bi xelat e.

Di 15 rojan de ci bersiv bigîhîjin destê me, em dê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 131'ê pirtûka Selîm 'Yûsiv û Zuleyxâ'ye.


Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nîrîxandin, divê hûn "Peyva Veşarı" di nava qutiyen li bin xacepirse de binivîsin û tevî navîşana xwe ji me re bişînîn.

Pênc kesen ku xelata hejmara 129'an kaseta Huseynkê Omerî qezencî kirine: Reşit Atak/Elîh, Lutfî Dağ/Stenbol, A. Vahap Oğurlu/Tokat, Vahap Yılmaz/Stenbol, İmam Tümen/ Semsûr.

Şehidek (wêne)	Roja çûyi	Tipek kurdî Li Misirê çemek	Herêmek Kurdistan ê Mecmuâ	Naveki Kurdî	Serokê şoreşa cotmehê	
Nepox, pîflik	Hêlin		Cermiyet, dernek Tipa pişti R yê		4	
Banêşane k	Sebzeyek			Cureyeki cetwelê		
Malkaç	Zimanek		Maxêñ tîrêneYur- datapan	Geşt	3	
Tipa pêşîn	Tipa pişti P yê Sewalek	Bi Kirdki Se Ícar, kirêkirin		Dengdêre n 'soro'		
Notirvan				Ne tir		
Belengaz feqîr Yezdanek				Bingehîn		
Ajansek Kofi..... Serokê NY ê		Bi hızûr, hêmin	Ne xerîb			
	2					
	1	2	3	4	5	6

PEYVA VEŞARI



VENGÜVAZEN KE HAMEY SANSÜKERDIN

Serokê Pêroyî yê PKK'î Abdullah Öcalan:

Peymanê alternatif virazê

27 tîrmeh 1998 duşem:

Dî "75 seriya Lozanî Konfransa Navneteweyî ya Kurdistanî" de Serokê PKK'î nameyekew panc rûpelî şirawit (rişt) û waşt di konferans de peymanêdo alternatif viraziyo.

Di nameyê xo de Öcalanî wast ke di seraçarnayina Peymana Lozanî de bi konferansêkew aneyîn (winayîn), nê tenî dîrokey mawa nizdî ser ro, la belê rewşa ewroyîn a kurdan û rastiyêdo ewroyîn ser ro jî bê vindartin. Serokê Pêroyî yê PKK'î Abdullah Öcalan nameyê xo de vat ke di dîrokey şarê Kurdistanî de peymaney zey Lozanî di sereya 1639 de Qasr-i Şîrin de hamîya îmzakerdin, la belê parçebiyanê Kurdistan a rastî di sereyê 1923'în bi Peymana Lozan vejiya werte. Serokê PKK'î "Dewletê Rojawa û Bolşevikên Rusya jî di ene (nê) peymane de hetkarîn kerdî û peyman viraziyawo. Bi nê peymane ermenî, asurî û grekî finayê seviyayê tayîniye, şarê kurdî berdê serê jenosid, vernî heme çî ene rastîkî dîrokî ya." Serokê PKK'î biyara Parlamana Fransaye a ke jenosidê ermeniyen qebûl kerd, hebey herey bo jî, di ca de dît û ana vat: "La çend jenosidê bînî estê. Enka serê jenosidê Kurdî de ecêba merdim senin awir bigîro. Raya pêroyî wijdan û hiqûqê navneteweyî bes qalê ma nêkeno û rastîyan nêvana.

Di namey xo de Öcalanî bal ant ser şerê ke Tirkîye bi teknolojî Kurdistan de duşetê şarê kurd de kena û vat: "Jo nêşkeno enî şerî îñkar bikerô. La Tirkîye di binê namey terorîzmî de îñkar (bi vatis Rojawa û bi taybetî hûkûmetan dawo qebûlkerdin) kena û góş nêdana hiqûqê şerî. Cade gere şima konferansêkew hiqûqî rê ray akerê. Hiqûqê şerî, Konvansyonê Cenevre ma qebûl kerd, ïnan qebûl nêkerd, çirê? Semedo ke sûcanê giranan kenê. Hesap persiyayina Hitlerî ra biyo moda, Şimago kîngâ hesab Hîtlerê ewroyî ê tewr zâlim ra hesab biwazê. Barêy Ewrûpaya di no sûcî de baş yeno vînayin."

Öcalanî besdaranê Konferansî yê Ewrûpâyi ra jî

persa: "Kanco (kamcîn) hiqûqê Ewropa de hendê perodayîşê heqê şaran esto" kerd û ana dewam kerd: "Kurdî bi şovenîzma bêsinor amey nêzdiyê werte ra wedartîş. Çewti Lozanî etiya de wa. Ganê hesab bêro perskerdin. İsmet Înönü 'Enî nûnerê Kurdi jî hetê mayê' vatiyê cê enka me darde bikerin. Eger heyetoke di bin Serokatî Înönü de bî, kurdi jî temsîl kerdêne, enka rewsey kurdan senîn a? Esas cawo ke tewr zehf konferans akero, eno ca wo."

Öcalanî veyn da zanyaran û siyasetmedaran "Ganê şima alternatifî na peyamana ke 75 serî verî hamey îmzekerdin, virazê." Di peyniya qisekerdina xo de Öcalanî ana vat: "75 serî yo ke ene peymanake niyardo ca heqê şaran, demokrasî çi esto gere di şexsê konferansê şima de bêro vatisî û bibo pêşnûmayêkew û zey tercîhekew newe raya pêroyî a dinya rê û şaranê Anadoli rê eşkere bikerê. Alternatifî ke vejiya werte gerek Jûbiyayîna Ewrûpâye jî qebûl bikerô."

28 tîrmeh 1998 sêşem:

MÊRDÎN DE HÎRÊ DEWÎ AMEY VEYŞNAYÎN

Eskeranê Qereqoley Çinaraltı 23 tîrmehî serê sibay eşîşî serê dewanê Şêkir (Kocasırt), Xirbabelik (Sivriye) û Merzika (Güzelâğac). Eskeran demêkew zehf serê dewijan de vindertî ke ïnan bikerê cehşî, la belê dewijan cehşî qebûl nêkerdê û eskeran dewijî keyan ra veti û keyey day veşnayin. Bexçey ke dewrê dew de bî, eskeran day ver adir û êgir nêveyşay jî bi panzêran sero şî û amê û yê xerepnay. Bi

tesîrê heway adir kewt ra ko û di rojî koyî veşnay.


Ewroj (emroj) eskeran rey girofî û nêverda jo (jû) şoro û bêro û dewijî bi kişten tehdît kerdî. Hîrê dewê ke hamey veşnayin, dewijanê cînan çî ke nêveyşay bî kom kerdî û koçê verê merdimanê xo Qoser, Masêrt, û Mêrdinî bî.

Serokê Şaxey Komelaya Heqê erdiman (İHD) a

**Alternatif
antlaşmalar yaratın**

SANSÜRLÜDÜR

Burada yeralan haberî İstanbul DGM
savcılığı tarafından toplatma gerekçesi
yapıldığından yayımılayamıyoruz.



Mêrdinî Cemil Aydoğan vat: "Ma parêzerê heqê merdiman, semedo heq nêro ecenayış zefê cayan ma mûdaxale kerdî, la Mêrdin de eskerî bi sero xo biyê dewlete." Projeya ageyrayına dewî, zûre veciya û Aydoğanî ana (wina) vat: "Eskerî zey şertê ageyrayin dewijan ra çehşibiyan wazanê. Dewijê ke çehşî qebûl nêkenê jî dewê ïnan hetê eskeran ra yenê veşnayin."

Serokê HADEPî ê Mêrdinî Cemil Kaya zî vat: "Hikûmet vanê OHAL Mêrdin ra hamewo wedartin, la belê karê dijê demokrasî verî ra biyo vêşî. Dewijê ke cerdevanî qebûl nêkenê binê zehmetî de yê. Hefteykew bostan û bexçey zehfî dewan veşnay. Ma reyna jî veyn denê rayedaran, ma wast ke ïnan hemverê karêdo teberê demokrasî û hiqûqî û eskeran vejiyê."


MED-TV LI CIHÊ BERÊ HEW WEŞANÊ DIKE

Navê satelita nû : Hot Bird 4

Transponder No: 117

Frekans No: 10.853

Derece: 13 Rojhîlat



Hûn dikarin li Rojhîlat, di derecaya 13'yan, frekansê 11.100'î û 1.100'î de, li MED-TV temâşe bikin.

Heger li ser van frekansan MED TV derneket, pêwîst e hûn LNB ya xwe biguherîn û LNB ya Unîversal bikirin.

WELAT

ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)

M. NURI KARAKOYUN

■ Yönetim Yeri

Istiklal cad. Asmali Mescit sok. 35/37 No:308

Beyoğlu/Istanbul
TEL: (0 212)
251 79 37-251 90 13
FAX: 251 95 85

■ Gerînneyê Gişî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMÎ TAN
■ Berpîrsê Karên Nîvîsaran
(Yazî İşleri Müdürü)

M. SALİH TAŞKESEN
■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım
■ NÜNERİTİVÎN ME
(Temsilciliklerimiz)

■ Mêrsin
Tel: 0 (324) 233 83 96

■ İzmir
Tel: 0 (232) 425 37 02
München:
(Nûnerê Gişî yê Ewrûpâye)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815

■ Swîsre:
Ihsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07
■ Hollanda:
S. A. Fewzi
31 104 85 55 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yusiv

Rojnamevan û Nivîskarê kurd Mabmûd Bakî:

Nivîsîna lehengiya gerîla

Li ser me ferz e

Palme, di rûniştina xwe ya bi rojnamevanekî kurd re wî wişa gotibû: "Pewist e gelê kurd pêşeroja xwe bi azadî diyar bike, sînor rabin. Dema pirsa kurdan çareser nebe, dê Kurdistan bibe Vietnam. Niha pirsa Vietnamê di rojevê de ye. Ev dê çareser bibe. Piştre pirsa Ìrlanda, Afrîkaya Başûr û Filîstînê dê were rojevê. Pirsa kurd jî dê bi van re têkeve rojeva cîhanê."

MAHMUT BAKSÎ, di sala 1944'an de li Xerzanê hatiye dînyayê. Pişti dibistana navîn, li Erxenê, dibistana mamostetiye dixwîne. Ligel mamostetiye, di rojnameya Batmanê de nivîsîn wî çap dîbin. Di sala 1969'an de pirtûka wî ya yekem "Mezra Botan" li Stenbolê derdikeye. Pirtûka wî tê qedexekirin. Piştre bi tehdîten dewletê re rû bi rû dimîne. Li ser xetereya zîndanîkirinê, derdikeye derveyî welêt. Heta niha 20 pirtûkên wî bi 8 zimanê cur bi cur hatine çapkîrin. Ew endamê "Yekîtiya Nivîskarên Swêdê" û "Organîzasyona Navneteyî ya Rojnamevanan" e. Mahmud Bakî niha li Swêdê dimîne. Em kurtehevpeyîna ku GABAR ÇIYAN pê re kiriye, diweşinîn.

Pişti cûntaya 12'ê rezberê, berê te û generalan ket hev, sedem ci bû?

✓ Terora ku bi serê kurdan de anîbûn, dikare bibe mijara bi sedan pirtûkan. Ji aliye kî ve bi ser sîvîlan ve diçûn û li aliye din bi ser girtîgehan de. Èrişen wan ne li Kurdistanê tenê bûn, destê wan dirêjî welatê din jî dibû. Lê li ser çalakîyen wan ên derveyî welêt zêde dellîl tûne bûn. Her tenê beyanên wan hebûn.

Di dawiya sala 1980'yî de, hêzên taybetî yên tîrkan, li Başûrê Biçûk, li bajârê Qamişlo 16 kesên şoşerger kuştin. Pişti bûyerê ez çûm Kurdistanê. Ez 3 mehan li wir mam. Min bi bertîlan wêneyên Qetîlama Qamişloyê bi dest xîstin. Piştre bi şahidîn bûyerê re ez rûniştîm. Wêneyên ku terora dewleta Tîrkiyeyê li derveyî welêt nîşan didan, ne li Swêdê tenê, li gelek welatê cîhanê di rojnameyan de çap bûn. Di sala 1981'ê de, çîroka wan xortêñ kurd bû pirtûk. Wê xebata min ji dewletê re serêsiyeke mezin derxistibû.

Tu bi gelek kesen navdar re rûniştîye û dîtinêñ wan li ser pirsa kurdan gitîye. Yek ji wan kesan Olof Palme bû. Dîtina wî li ser pirsa kurd û çareser-kirina wê ci bû?

✓ Ji 70'yî û vir ve danûstandinêñ me hebûn. Rojnameya ku nivîsîn min tê de dihatin weşandin "Aftonbladet", nêzî wî bû. Bi saya rojnamevaniye, Palme jî di nav de, ez bi gelek endamîn Senatoya Amerîka û Parlementoya Ewropayê re rûniştîm.

Palme, bi rûniştina xwe ya bi rojna-

mevanekî kurd re pir dilxweş bûbû. Wî wişa gotibû: "Pewist e gelê kurd pêşeroja xwe bi azadî diyar bike, sînor rabin. Dema pirsa kurdan çareser nebe, dê Kurdistan bibe Vietnam. Niha pirsa Vietnamê di rojevê de ye. Ev dê çareser bibe. Piştre pirsa Ìrlanda, Afrîkaya Başûr û Filîstînê dê were rojevê. Pirsa kurd jî dê bi van re têkeve rojeva cîhanê." Palme, li ser xwestina otonomiyê nerazîbûna xwe nîşan dida.

Digot: "Mirov ji bo tişîn wisan ev qasî xwînê na-rijîne. Divê hûn ji bo azadiyê li ber xwe bi-din, da ku mirovahî dengê we bike."

Lê pişti kuş-tina wî, bê-bextiyeke me-zin xistin stûyê kurdan. Paşê jî şefê polîsan Hans

bêkes bûn, berê xwe dane kurdan.

Ev xebat bi zanyari dihat meşandin. Kesên welatparêz zû bi vê yekê hesiyan. Ez li diji teoriya Holmîr derketim. Pir nivîsîn min li ser vê babetê (mijarê) weşîyan. Hans Holmîr piş re teoriyên xwe kirin pirtûkek. Di roja danasîna wê de, bi gelek rojnameyan re ez jî besdar bûm û min li wir jî ew gunehkar kir. Wî şes milyon kron ji rojnameyeke swêdî standibû. Min ew bi dîtina wî, ku wekî berdevkê Tîrkiyeyê bû, sûcîdar kir. Ew li wir têk çûbû û gelek rojnameyan qala vê yekê kiribû. Piştre, min der heqê têkiliyên Holmîr ên rojnameya Hürriyet û MîT'ê de lêkolînek fireh kir. Ew di rojnameyekê de ha-tin weşandin. Ji ber ku min qala têkiliyên Holmîr û Erol Simavi yê homoseksuelî kiribû, Erol Simavi pir hêrs

Beyan dida rojnameyan ku ew ê Swêdê ceza bikin. Kirinê wî, bûn sedem ku xebata tevgera neteweyî li paş bikeve.


Di van rojan de we bi pirtûka xwe "Hêlin" Xelata Taybetî ya Ciwan û Zarokan li Awistûryayê wer-girt. Lê li aliye din, berê te û endamekî Înstîtu-ya Kurd li Parîse kete hemberî hev û din. Sedem ci bû?

✓ Pirtûka min a "Vîdeo Gelîn" neqencyen kurdêñ li derveyî welêt derdixe ber çavan. Qala mîrên kurdan dike ku çawa tadehiyê li jînîn kurdan dikin û wan dixapînîn.

Behsa wê dike ku çawa mîrên kurd bi filmê vîdeoyî jinan ji rê derdixin; wan hildibijêrin, bi wan re dizewicin û tînin Ewropayê. Paşê, wan mîna dîlan bi kar tînin. Îcar kesek bi navê 'Huner' ku endamê Înstîtuya Kurd li Parisê ye, bêyî ku destûra min bistîne li ser bingeha pirtûka min filmek çêkiriye. Wî kesî beşike nû bi pirtûkê ve kiriye û film kişandîye. Film bi naveroka xwe li diji PKK'ê ye. Ev dijîtî bi destê "huner" ha-tiye çêkîrin. Tişîe ku kiriye qet nayê pejirandin. Divê mirov carîna dersê bide mirovîn wisan ku bi keda mirovan dilîzin. Min di heqê wî de mehkeme vekir. Bi qasî yek milyon frankêñ fransî, divê bide.

Qet nehatîye bîra we, ku hûn li ser şervanîn kurdan jî binivîsin?

✓ Qet ji bîra min dernektîye. Min pir caran xwestiye ku gazî min bikin da ku ez herim serê çiyayê Kurdistanê; li wir bêhna kulîlkîn rengîn bikişînim nav hinav û dilê xwe; bi çavêñ xwe lehengiya qîz û xortêñ kurdan bibînîn. Qehremaniya wan têxim ser rûpelan û wergerînim zimanêñ din. Lê mixabîn e ku ev derfet çênebû. Lê hîna jî ne dereng e. Heta ku ez neçim serê çiyayê Kurdistanê û bi gerîla re rûnenim, bi wan re negerim, çîroka wan nenivîsim, ez mirinê qebûl nekim. Pişti ku min nivîsand, êdî mirin hat, ser seran ser çavan. Nivîsîna vê lehengiyê li ser me rewşenbîren kurdan ferz e. Li ser me deyn e. Ez niha nexwîş im. Lê dîsa jî ez dixwazim herim û bi kîfxwesi xebateke wisa bikim.



Mahmûd Bakî, bang li nivîskaran kir û got: "Li ser me deyn e ku em lehengiya gerîla binivîsin."

Holmîr û rojnameya Hürriyetê ev bêbextî bi xwîn û goşt kir. Lê tu bê-deng nemabû û te şerê Holmîr kir. Bi kinahî tu dikarî qala wan rojan bikî?

✓ Kesên ku Holmîr şaş kiribû û tesîr lê kiribû, MîT'a Tîrkiyeyê bû û çend xayînêñ kurdan bûn ku piştre PKK'ê ew ji nav xwe avetibûn. Li ser zanyariyê şaş, kurd dihatin mehkûmkirin. Polîsîn Swêdê li qatîlekî digeriyan û pêwîst bû bidîta û pê bihêzbûna xwe nîşan bidana. Ji ber ku dewleta kurdan tunebû û em

bûbû. Xwest ku min bide mehkemeyê û bi milyonan kron ceza ji min bistîne. Min jî got, ez nikarim bi kesekî AIDS'î re rûnêm. Divê Simavi belgeyekê ji cem doktoran bîne ku ne AIDS e, wê demê ez dikarim herim dadgehê. Têkiliyên Simavi û Holmîr bûbûn benîşt û ketibûn devê xelkê. Bê garantiya nexweşxaneyê ezê neçûma tu mehkemeyan.

İro bêgunehiya kurdan baştır tê fêmîkirin. Lê wê demê kesê herî sûcîdar Parêzer Hüseyin Yıldırım bû. Gelek şastiyyen ku çêbûn, tev wî organîze dikirin.